# Boykot bersiva înkar û asîmîlasyonê ye



**Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş anî ziman ku boykot dê li hemberî polîtîkaya dewletê ya ku asîmîlasyon û înkarê li ser gelê kurd ferz dike bibe bersiveke xurt. Demîrtaş derbirî ku êdî tu kes nikare gelê kurd bi derewan bixapîne û gelê kurd li hemberî dek û dolaban hişyar bûye. Demîrtaş got ku di vê pêvajoyê de ji bo ku gelê kurd dest ji boykotê berde gelek kirinên derexlaqî jî pêk hatin**

### 'LI HEMBERÎ GEL DEK Û DOLAB GERANDIN'

Demîrtaş anî ziman ku di xebatên referandûmê de derketiye holê ku hêviya 'Kurd BDP'ê guhdar nakin û em dikarin wan li gorî dilê xwe bi rêve bibin' serneketiye û Demîrtaş wiha got: "Li dijî me zextên ku neyê bîra mirov meşandin. Me heta niha ev aşkera nekir lê dive ku em piştî referandûmê aşkera bikin." Demîrtaş anî ziman ku ji hişmendiya dewletê dûr ketine.

### 'GELÊ KURD PERGALA DEWLETÊ NAS NAKE'

Demîrtaş diyar kir ku bi boykotê ve lêpirsîna rejîma Tirkiyeyê pêk hatiye û wiha axivî: "Kurd tenê guhertina makezagonê û AKP'ê boykot nakin. Gelê kurd pergala ku ji sala 1924'an heta niha kurdan wekî kole dibîne boykot dikin. Ji vê pergalê diqetin. Dibêjin ger ev pergal me nasneke em jî vê pergalê nasnakin... RÛPEL -5

www.welat.com

# Rojeva Welat

8 Îlon 2010 Çarşem Buha: 50 Kr Hejmar: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com

# Hîmê konferansa kurd hate avêtin

Heyeta BDP û KCD'ê ku di bin serokatiya Ahmet Turk de li Herêma Federal a Kurdistanê gelek hevdîtin pêk anîn, Turk got ku niha bingeha konferansa neteweyî tê avêtin û bawer dikin ku dê di demek nêzîk de konferansê pêk bînin. Turk baweriya xwe ya ji bo yekitiyê anî ziman



### 'BINGEHA KONFERANSA NETEWEYÎ AVA BÛYE'

Heyeta Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) û BDP'ê ji bo xebatên yekitiya neteweyî li Başûrê temam kirin û vegeriya. Hevserokê KCD û Serokê Heyetê Ahmet Turk der barê hevdîtinan de agahî dan û got ku ji bo yekitiya neteweyî bingeh avabûye. Turk anî ziman ku ji bo konferansa neteweyî jî hêvî ji her demê xurtir bûne. Turk, encamên civîn û amadekariyên konfaranseke kurd anî ziman û diyar kir di demek kin de gelek gavên girîng hatin avêtin.

### 'XEBATÊN JI BO KONFERANSÊ DÊ GUR BIBIN'

Turk, da zanîn ku ji bo hin gavên erênî bê avêtin pêdivî bi konferansa neteweyî heye û wiha axivî: "Dê hemû partî, sazî, dezgeh û komeleyên kurd beşdarî konferansê bibin û li ser pirsgirêk û çareseriya pirsgirêka kurd niqaşê bimeşînin. Ji bo her perçeyekî kurdistanê dê pirsgirêk bê tespîtkirin û çareseriya dê bê niqaş kirin. Ji bo vê yekê jî konferans ferz e. Niha niqaşên me yên pêkanîna konferansê didomin. Ji bo avakirina projeya xweseriya demokratîk ev lazim e... RÛPEL - 4

## EDÎTOR...

### Karwanê azadiyê dimeşe

Rojnamegeriya kurdî evîneke bê hempa ye. Evîneke bi baweriya serkeftinê hatiye peyitandin. Baweriyeke wisa xurt e ku li hemberî ba û bahozên dagirkerên welatê me her tim li ser piyan maye û tu carî serê xwe netewandiye.

Di van salên dawî de dixwazin baweriya gelê kurd a ji bo serkeftinê bişkênin; yekser êrîşî rojnameyên kurdî dikin. Azadiya Welat di nava 4 salan de 8 caran hate girtin. Li dewsa Azadiya Welat, ji bo ku xwendevan û dildarên zimanê kurdî bê rojname nemînin, Welat, Dengê Welat, Hawar û Rojev derketin… Lê ew jî bûn hedef. Herî dawî rojnameya Rojev ku li dewsa Azadiya Welat derketibû hate girtin. Çar rojan beriya Rojevê, Azadiya Welat hatibû girtin.

Girtina rojnameyên bi kurdî weşanê dikin divê ji rêzê neyên dîtin.

Du aliyên van girtinan hene. Dewleta tirk kengî bixwaze moral û motîvasyona gelê kurd têk bibe hemleyeke bi vî rengî pêk tîne. Rojnameyên bi kurdî weşanê dikin, digire. Lewre; baş dizane ku gelê kurd girîngiyê dide pêşvebirina zimanê xwe û rojnameyên bi kurdî weşanê dikin wekî rûmeta zimanê xwe qebûl dike. Ji ber hindê jî rojnameyên me dibin hedef.

Noqteya duyemîn jî ew e ku rojnamegeriya kurdî di warê hişmendiya neteweya demokratîk de roleke hişyarker dilîze. Mînak sekna rojnameyên me ya li hemberî referandûmê û daxwazkeriya ji bo xurtkirina boykotê bixweşa iktîdara dewleta tirk neçû. Hejmara Azadiya Welat a bûye sedemê girtina wê bi manşeta 'ÇIMA BOYKOT?' derketibû. Hejmara Rojevê ya bûye sedemê girtina wê jî bi manşeta 'BOYKOTÊ BIŞIDÎNIN' bû.

Ji destpêka salên 90'î heta niha gelek caran rojnameyên bi kurdî weşanê dikin hatin girtin û doz lê hatin vekirin. Wê demê ji ber wêneyan doz lê dihatin vekirin û dihatin girtin. Digotin 'Weşaneke nayê zanîn bi kijan zimanî weşanê dike'. Lê niha tablo guherî. Ji ber naverok û sekna rojnameyan a saxlem rojnameyên me têne girtin.

Belê zext û zor, girtin ji bo me dibe sedemê dilşikestinê û me didin zorê. Lê ji bo me cihê kêfxweşiyê ye ku sekna rojnameyên me li Tirkiyeyê desthilatdariyê dide zorê.

Azadiya Welat hate girtin, Rojev derket…

Rojev hate girtin, niha jî Rojeva Welat derdikeve…

Ev karwanê baweriya xwe bi sonda şehîdan xurt kiriye dê bimeşe. Her ku diçe jî dê xurtir bibe. Tu ba û bahozan nas neke û riya xwe her berdewam bikî.

Ne wesyeta şehîdan, ne jî baweriya gelê kurd li erdê namîne.

Li ser vê bawerî û sonda şehîdên Çapemeniya Azad em bi dilgermî dibêjin merheba…

# Di kontrola dewletê de şîdet



Malbata Sidika Platîna, li navçeya Seraya Wanê, rastî îşkenceya hevserê xwe Faruk Platîn hatibû aşkera kir ku ji ber Faruk Platînê ku tê gotin têkiliya wî bi JÎTEM'ê re heye, nehatiye girtin, ewlehiya Sidika Platînê nemaye. Di vê navberê de dermankirina Sidika Platîn jî di nexweşxaneyê de didome. Malbata Sidika Platîn, ji ber ku Faruk Platîn nehatiye girtin, ji Serokomar Abdullah Gul û Serokwezîr Recep Tayyîp Erdogan re ji bo piştgiriyê nameyek şand. Birayê Sidika Platîn Mehmet Nurî Ozer, diyar kir ku Karta Kesk ya Sidikayê li mala Faruk Platîn maye û ji ber ku ewlehiya wî tuneye, ew nikare biçe kartê bîne. RÛPEL - 3

# Cezayê pere li kurdî hate birîn

Zext û zordariyên li ser kurdî her roj zêde dibin û berdewam dikin. Piştî Rojnameya Azadiya Welat hate girtin, afîşên kurdî hatin komkirin niha jî zordariyekî din derket holê. Vê çarê dadgehê, li girtiyên bi kurdî parastin kirin 100 TL cezayê wergerê li wan birî. 59 girtiyên siyasyî yên di Girtîgeha Tîpa F a Kurkçulera Edeneyê de di mînin di navbera 1 û 2'yê tîrmehê de ji bo çareseriya pirsgirêka kurd û balê bikşînin ser operasyonên leşkerî û zextên li ser gelê kurd 2 rojan greva birçîbûnê li dar xistibûn. Li Amedê jî pirtûka bi kurdî ne girtin girtîgehê... R-3

## Xelatên rojnamegeriya kurdî û şehîdên çapemeniyê yên MÛSA ANTER - 2010

SERTÊN TEVLIBÛNÊ Rûpel - 11

Cemal Şerîk

# Amed ne bêxwedî ye

Serokwezîrê Tirk R.T.Erdogan di 3'ê îlonê de li Amedê axivî. Di axaftina xwe de cih da Zindana Amedê ya Hêjmar 5'an. Behsa îşkenceyên piştî 12'ê Îlonê li vir hatine kirin kir. Beriya R.T.Erdogan bê Amedê bi çend rojan, çend kesan li ber Zindana Amedê daxuyanî dabûn, diyarkiribûn ku dê di 12'ê Îlonê de piştgiriyê bidin AKP'ê. Bi vê yekê hevkariya xwe ya bi Erdogan re anîn ziman. Hevkarî û piştgiriya AKP û çend kesên ku di nava xwe de li hev kirine pirsgirêka wan bi xwe ye. Li ser vê mijarê mirov tenê dikare bêje xêrê ji hevkarî û şirîkatiya xwe bibînin.

Li vir mijara ku mirov li ser raweste ne têkiliya axa û xulam e. Divê tiştê ku mirov li ser raweste û girîngiyê bide axa û xulam têkiliyê bi hev re datînin Zindana Amedê ku bûye sembola îşkence û berxwedanê ji xwe re dikin amûr. Di vir de divê bê zanîn ku li vir xafilî û hîleyek xapînokê heye. Her tim ji bo ser rastiyan bigirin û gel bixapînin serî li fêl û zexeliyan didin. Bi van zexeliyan dixwazin civakê bizêrînin û bixapînin.

Li Zindana Amedê kê îşkence dît? Kî hatin qetilkirin? Li hemberî îşkenceyên xedar kê li ber xwe da? Kê li wir jiyana xwe feda kir? Ne hevkarên AKP'ê yên li ber Zindana Amedê daxuyanî dan, ne jî li ser navê AKP'ê tu kes nikare bersivê bide vê yekê. Ligel vê rastiyê ev kesana derketin holê. Derdikevin li Amedê behsa îşkenceyên piştî 12'ê Îlona 1980'an li Zindana Amedê pêk hatiye dikin û li ser vê zindanê û îşkenceyê dixwazin kesan di 12'ê Îlonê de bi dûvê xwe ve girêbidin. Bi vî rengî hestên gel tahrîk dikin.

Li Tirkiyeyê ji ber ku hêzên demokrasiyê di nava pirsgirêkan de ne û serkeftinek mezin bi dest nexistine, kesên dixwazin AKP'ê bikar bînin û AKP'ê dixwaze helwestek xwe ya bi vî rengî li Amedê derxe ser dikê. Feraseta AKP'ê ya bazirganiyê, li ser Gelê Tirkiyeyê jî bandorekê çêdike. Di nava xebatên propagandayê de ev yek tê xuyakirin. Hêj di nava gel de nayê zanîn ku dê di 12'ê Îlonê de kîjan deng bê avêtin. AKP bi van lîstik û hîleyên xwe, bi fêl û zexeliyên xwe dixwaze bertek û helwesta gel a li hemberî darbeya leşkerî ya 12'ê Îlonê li aliyê xwe kom bike. Bi vê helwesta xwe jî qaşo li dijî derbeya 12'ê Îlonê de xwe dide xuyakirin.

Di pêvajoya 12'ê Îlona 1980'an de partiyek bi navê AKP'ê hebû? Wê demê R.T. Erdogan û derdorên wî li ku bûn? Kesên ku îro hêj nû hatiye bîra wan ku kurd in û ji bo bibin şirîk û hevkarên AKP'ê daxuyaniyan didin heta niha li ku bûn. Îro kesên ku divê li ser darbeya 12'ê Îlona 1980'an ne axivin divê ev bin. Tu mavê vana yên axaftinê tune.

Ne mafê AKP'ê û ne jî mafê hevkar û şirîkên AKP'ê heye ku li ser van êş û birînên li siyasetmedarên kurd hatiye kirin, siyaset û propagandayê bikin. Bi tu awayî mafê AKP'ê û hevkarên wê tune ku li ser êş û îşkenceya di darbeya leşkerî ya faşîst a 12'ê Îlonê de li dijî hêza demokrasiyê hate kirin siyasetê bike. Her kes qumaş û cewherê AKP'ê dizanin çi ye. Her kes dizane ku sazûmankar û kadroyên AKP'ê ji sîsika darbeya 12'ê Îlona 1980'an geş bûne û mezin bûne. Kesê ku ruh û koka Cemîl Çiçek, Abdulkadîr Aksu, Vecdî Gonul û hwd. nizanibe tune. Her kes cewherê wan baş nas dike. R.T.Erdogan, îro derdikeve dibêje li dijî makeqanûna faşîst a 12'ê Îlonê ye. Dibêje ji bo dijberiya xwe ya makeqanûna 12'ê Îlonê dê dengê erê bikar bîne. Dîsa têkiliya R.T.Erdogan, Abdullah Gul, Cemîl Çiçek, Abdulkadîr Aksu û hwd a bi darbekarê cuntaya 12'ê Îlona 1980'an û Serfermandarê Giştî yê Cendermeyan Nurettîn Ersîn re ji aliyê her kesî ve baş tê zanîn.

Li gel vê rastiya ku ji aliyê her kesî ve tê zanîn, derdikeve qadan û dijberiya xwe ya li hemberî 12'ê îlonê tîne ziman. Dixwaze bertekên gel ên li dijî faşîst li aliyê xwe kom bike. Ev helwesta Erdogan tu barewiyê nade kesî. Erdogan, qet nikare vê helwesta xwe û lîstikên xwe li bajarên kurdan bide bawerkirin. Gelê kurd, civakek polîtîk û bi exlaq e. Ev aliyê xwe yê polîtîk û exlaqî di gelek aliyan de nîşan daye. Ev rastiya, lêxwedîderketin û parastina kurdan a nirxan ya li dijî faşîzma 12'ê îlonê dide nîşan.

Kurdan, têkoşîna xwe ya li dijî faşîzma 12'ê îlonê her tim daye nîşan û her tim li nirxên xwe xwedî derketiye. Aliyê xwe yê berwedêr û rêxistinî bi baldariyek mezin parastine. Ji ber vê yekê ne AKP û ne jî hevkarê AKP'ê nikarin bi nirxên kurdan bilîzin û van nirxên kurdan li hemberî wan bikar bînin.


Ev rastî girîng e. Dixwazin Zindana Amedê ya hêjmar 5'an ku ji bo kurdan rûmeta berxwedanê ye, hilweşînin û vê dîrok û çanda berxwedanê û zilma li kurdan hatiye kirin ji rûpelê dîrokê paqij bikin. Ev daxwaz ji bo kurdan neheqiya herî mezin e. Kurd bi tu awayî vê daxwazê qebûl nakin. Ev neheqî ji aliyê AKP'ê û hevkarên AKP'ê ve li kurdan tê kirin. AKP, bi vê yekê jî nehatin ser li Amedê ku berxwedêrên 14'ê Tîrmehê yê Rojiya Mirinê li Amedê jiyana xwe ji dest dan di meha îlonê de kurdan kir.

Em li vir careke din berxwedêrên Greva Mirina Mezin a 14'ê tîrmehê, Kemal Pîr 7'ê îlonê, M.Hayrî Durmuş 12'ê îlonê, Akîf Yilmaz 14'ê tîrmehê û Alî Çiçek jî di 16'ê îlonê de jiyana xwe ji dest dan bibîr tînin.

Gelê kurd, ev zarokên xwe yên êgîd ên wekî nirxên herî mezin qebûlkirine, ji bîr nekiriye. Xwedî li berxwedana li Amedê derketine û li erdê nehiştine. Gelê kurd ev nirxên xwe yên ku wateye û girîngiyek mezin dide wan ji bîr nekirine û nake. Gelê kurd li berxwedana têkoşerên Zindana Amedê xwedi derketiye û ew tenê nehiştine.

Ji ber vê yekê jî gelê kurd axaftina Serokwezîr R.T. Erdogan û hevkarên AKP'ê yên li ber Zindana Amedê daxuyanî dan, wekî heqaretek mezin dibîne û qebûl nake. Gelê kurd van daxuyaniyên ku ne di hedê wan de ye qebûl nake û destûr nade. Divê tu kes xwe nexapîne û Gelê Amedê jî zanibe ku berxwedana li Amedê hatiye avakirin ne bêxwediye. Gel ev helwesta xwe jî di 3'yê îlonê de bi eleqe nenîşandana mîtînga R.T. Erdogan a Amedê nîşan daye.

Ew hevkarên li ber Zindana Amedê ya Hejmar 5'en daxuyanî dan jî û R.T. Erdogan ê di axaftina xwe ya li Amedê de cih da îşkenceyên di 12'ê Îlona 1980'an de li wir pêk hatine jî lazime vê rastiyê ji bîr neke.



# Xweseriya demokratîk û zimanê wê xeta sor e

ADIL QAZÎ

Di 4 û 5'ê îlonê de Konferansa Qada Civakî ya Navendî pêk hat. Di serî de vê gava dîrokî û ew çend jî pîroz ji dil û can silav dikim. Li gelê kurd û Kurdistaniyan pîroz be. Bi vê gava dîrokî Tevgera Azadiya Gelê Kurd carekî din mora xwe li rojev û pêvajoyê xist. Hêna Konferans dest pê nekiribû rojeva Tirkiyê bû Xweseriya Demokratîk. Wekî; ev çi bû! Ev ji ku derket, ka çi ye, di binê wê de çi radizê û hwd. Di nava aqilmendên dewletê de, bi raya xwe ya giştî ve wekî ku gizûz bikeve nava wan, tînin ser ekranên xwe û li gor xwe nîqaş dikin. Ev hêlekî wê ye ku mijareke xweser e. lê ya ku ez dixwazim li ser rawestim hêlekî din e. Roja ewil ku Konferansê dest pê kir di heman katê de AKP'ê jî li Amedê mitîng çêdikirin. Çi encam girt, an jî bi gotineke nûjen 'siwar hat û peya çû'. Ev jî mijareke din e.

Destpêkê de ez vê bibêjim. Encama vê konferansê çi dibe bila be, çawa ku di warê siyaseta Tirkiyeyê de, di raya giştî ya Tirkiyê de gaveke dîrokî ye, her wiha di warê ziman de, ji bo raya giştî ya kurd jî gaveke dîrokî û serkeftî ye. Ev şikandina hişmendiya asîmîlasyonîst bû. Ang gelê kurd û di serî de jî Tevgera Azadiya Gêlê Kurd gava di tiştekî de biryar bida, tiştê ku bida ber xwe teqez biser dixe. Pêk tîne. Hemû hêvî û bendewariyên Sîstema 88 salan ku înkar kiribû, digot; 'bi zimanê kurdî siyaset nayê kirin' û hwd. Pûç derxist. Ev bêguman ev cihê kêfxweşî û şanaziyê ye. Lê bi ya min ev têr nake û pir kêm e. Ji ber ku di dîwanê de du hevalên ku baş dikaribû xwe bi Kurdî îfade bikin, binirxînin û bi rêve jî bibin hebû. (her çende bi piranî kurdî bi rêve birin jî). Ji nêzîkî 400 delegeyan ji sedî heştêyî wan (%80) xwe bi kurdî dikaribûn bianiyana ziman. Ji ber ku hê jî baş feraseta xweseriya demokratîk nehatiye fêm kirin ev berevajî meşiya. Lewra ji sedî encax bîstê wî bi kurdî axaftin û nirxandinê xwe kirin. Yên ku bi rastî jî xwe bi kurdî nedîkari bû baniyana ziman hebûn. Lê weke ku me li jor jî gotibû ewqasa jî ne zêde bûn. Rewşa herî kambax ew bû ku gava dîwan di nava xwe de diaxiviyan bi zimanê tirkî bû.

Di navberan de jî dîsa welê, nîvê pirê beşdarvanên konferansê bi hevdu re bi tirkî diaxiviyan. Yanê ev jî tê vê watêyê ; 'binêrin, ez dikarim bi kurdî şirove bikim, bi rê ve jî bibim lê ez dîsa ji zimanê tirkî hez dikim'! bi navekî din 'di dîtbariyê de bibînin ku ez bi kurdî jî dizanim, lê jiyana min welê dirûv girtiye, ez welê bi tirkî didomînim'! ev jî nêzikahiyeke polîtîk e dide xuyakirin. Divê mirov xwe nexapîne. Ango weke amûreke nêzîkî zimanê xwe yê zikmakî nebe. Çawa ku di rêziknameya xweseriya demokratîk de Ziman weke xeta sor derbaz dibe, lê ji bo wan kesan zimanê zikmakî xeteke wan ya sor nîn e. Tiştekî ku jêveneger nîn e! Gava ku pêwîst bike bi wî zimanî diaxivin. Ji bilî zimanê zikmakî, zimaneke din ku pêwîst bike (ew jî zanibe) divê mirov bikar bîne. Yek ji stûna pergala xweseriya demokratîk jî zimanê wê ye. Di xwendina pêşnûmaya xweseriya demokratîk de weke biryar tê destnîşankirin ku; hemû civîn û daxuyaniyên hemû rêxistin, sazî û komeleyan bi kurdî be.

Lê ew pêşnûma bi xwe jî tirkî tenê bû. Dîsa; nûsafên hemû sazî û komeleyan (ji bilî ya TZPKurdî) bi tirkî bû. Çawa ku nusaf, nirxandin, pêşniyar û şirove bi piranî tirkî bû her waha encamname jî bi tirkî bû. Ev li gel nav û naverokeke têr û tije encamnameya wê ne li gor wê bû, bi ya min. Bi rastî jî cara ewil e ku binesaziyeke ewqas girîng tê avêtin û ji hemû bajar û herêmên Kurdistanê tevli dibin. Di roja dawî de ku tûşî mitîngeke girsehî ya Boykotê jî bû ev, coşî û kelecana xwederiya demokratîk gihande lûtkeya herî jor. Dubare pîroz be li me hemûyan!


## XAÇEPIRS

**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Çiyayê Kurdistanê yê herî bilind **2.** Bayê zexm û boş... Kûzê avê **3.** Tiştê ku pê debar tê kirin... Hesinê ku li binê piyê hespan dixin **4.** Dar an jî hesinê ku didine ser stûyê ga ku pê erebe dikişandin an jî cot dikirin **5.** Pêvedana bi hesinekî sincirî... Xanedana qraliyeta Vîetnamê **6.** Baneşana ku pê ga tê ajotin û sekinandin... Heta hetayê **7.** Kurtebêja otomobîlê... Li Colemêrgê gotina 'yek'ê... Notayek **8.** (Şîrê …) Şîrê cara yekemîn ê di pey zayînê de ye, ku rengê wê zerik e... Amûreke çandiniyê ya ku pê zad tê çinîn **9.** Kar û xebat... Têbinî

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Ji bo firehî, dirêjî û kûrahiya tiştekî... Firişteyên bihuştê **2.** Cureyekî xwînê... Keç **3.** Di heyna berê ya yewnanan de devera ku gelê Sîteyê ji bo ku li ser siyaset, rêveberî û bazirganiyê mijûl bibin, lê diciviyan... Baneşana kêfxweşiyê **4.** Heke... Kurtebêja Ksenonê... Rojek **5.** Plakaya navneteweyî ya Îranê... Berxikên 1-3 hefteyî **6.** Cihê ku tam di orteya du tiştî de ye **7.** Vê carê... Peyveke teşwîqkirinê **8.** Eşîr, qebîle, hoz... Paytexta Perûyê **9.** Nexweşiyek... Daçekek... Pêxemberek



www.arsivakurdi.org

# Îşkencekar Faruk Platîn nayê girtin

## Malbata Sidika Platin diyar kir ku Faruk Platîn, têkiliya wî bi JÎTEM'ê re heye û ji ber vê nayê girtin û ewlehiya Sidika Pilatînê nemaye. Her wiha dermankirina Sidika Platînê jî li nexweşxaneyê didome

**WAN / DÎHA -** Malbata Sidika Platîna, li navçeya Seraya Wanê, rastî îşkenceya hevserê xwe Faruk Platîn hatibû aşkera kir ku ji ber Faruk Platînê ku tê gotin têkiliya wî bi JÎTEM'ê re heye, nehatiye girtin, ewlehiya Sidika Platînê nemaye. Di vê navberê de dermankirina Sidika Platîn jî di nexweşxaneyê de didome.

Li gundê Hêretilê ya navçeya Seraya Wanê, jina bi navê Sidika Platîn rastî îşkenceya hevserê xwe Faruk Platîn hatibû. Platîn, piştî dermankirinê dîsa bi biryara dadgehê radestî hevserê wê hatibûn kirin û piştî demekê, cardin ji ber lêdana hevserê xwe Faruk Platîn hatibû ber mirinê. Li gel ku hêj Faruk Platînê, tê gotin, têkiliya wî bi JÎTEM'ê re heye, nehatiye girtin, dermankirina Sidika Platînê jî li nexweşxaneyê tê domandin.

### Malbatê name şand

Malbata Sidika Platîn, ji ber ku Faruk Platîn nehatiye girtin, ji Serokomar Abdullah Gul û Serokwezîr Recep Tayyîp Erdogan re ji bo piştgiriyê nameyek şand. Birayê Sidika Platîn Mehmet Nurî Ozer, diyar kir ku Karta Kesk ya Sidikayê li mala Faruk Platîn maye û ji ber ku ewlehiya wî tune, ew nikare biçe kartê bîne. Ozer, destnîşan kir ku ji bo ku kart binîn serî li cendirmeyan daye, lê cendirmeyan ji wî re gotiye ku, bila ew kartê xwişka xwe bîne. Ozer, wiha domand: "Faruk ji dewletê hêz digire. Ji ber ku min gotiye têkiliyên Faruk bi JÎTEM'ê re hene, li qereqolê gef li min xwarin. Dixwazin, vê mijarê veşêrin. Gelek caran bi kêfî nahêlin ez biçim cem xwişka xwe. Neheqiyê li me dikin lê Faruk nagirin. Êdî tu hêviya min nemaye."

### Dermankirina Sidikayê didome

Dermankirina Sidikayê hêj didome. Hate diyar kirin ku 2 polîs li ber deriyê odeya wê radiwestin û nahêlin tu kes biçe cem Palatîne. Her wiha hate destnîşan kirin ku ji ber hêj îfadeya Sidika Platîn nehatiye girtin, polîs ji bo ewlehiyê li ber deriyê wê radiwestin.



# Dadgehê ji bo parastina kurdî 100 TL ceza birî

**EDENE -** 59 girtiyên siyasî yên di Girtîgeha Tîpa F a Kurkçulera Edeneyê de ne, ji ber ku 3 mehan ji faliyetan hatine menkirin îtîraz kirin. Girtiyan, bi komên ji 9 kesan pêktên li Edliyeya Edeneyê îfade da. Hemû koman bi zimanê dayikê parastina xwe kir lê koma herî dawî ya di 31'ê tebaxê de derketî dadgehê ji bo ku kurdî parastinê bikin hatin astengkirin. Dadgeha ku nehişt girtî bi kurdî parastinê bike cezayê dîsîplînê bikaranî û ji bo her girtiyekî ji 100 TL cezayê pere yê wergerê birî.



Zext û zordariyên li ser kurdî her roj zêde dibin û berdewam dikin. Piştî Rojnameya Azadiya Welat hate girtin, afîşên kurdî hatin komkirin niha jî zordariyekî din derket holê. Vê carê dadgehê, li girtiyên bi kurdî parastin kirin 100 TL cezayê wergerê birî. 59 girtiyên siyasyî yên di Girtîgeha Tîpa F a Kurkçulera Edeneyê de di bînin di navbera 1 û 2'yê tîrmehê de ji bo çareseriya pirsgirêka kurd û balê bikşînin ser operasyonên leşkerî û zextên li ser gelê kurd 2 rojan greva birçîbûnê li dar xistibûn. Girtiyên ketine greva birçîbûnê bi riya Midûriyeta Girtîgehê ji Wezareta Dadê re bi daxwaznameyên kurdî nivîsandin. Midûriyeta Girtîgehê daxwaznameyên dane, ji Wezareta Dadê re neşandin û lêpirsin der barê girtiyan de vekir û 3 meh cezayê qedexeyê yê faliyetan hundir dan. Girtiyan li hember cezayê dîsîplînê yê 3 mehan îtîraz kirin û di meha tebaxê de bi komên ji 9 kesî pêktê îfade da dadgehê.

### Bersiva hemû pirsan...

Îfadeyên hemû girtiyan li Edliyeya Edeneyê hatin girtin. Hemû girtî bi komên ji 9 kesî pêkdihatin bi dor birin îfadeyan. Koma yekemîn, diyar kir ku ew dê di dadgehê de bi kurdî parastinê bikin ji ber vê yekê jî ji dadgehê daxwaz tercumanekî kirin. Koma yekemîn bi kurdî parastin kirin û sedem û armanca greva birçîbûnê vegotin. Hemû koman bi alîkariya wergêr parastinên xwe kirin.

### Wateya neparastinê

Li ser vê yekê Dadgeriya Înfazê, diyar kir ku kesên tirkî dizanin pereyê wê tercûman dewlet nade û kesên tirkî dizanin lê neaxivin di nav helwestekî xiraba dan e. Dadgehê ev yek wekî parastin qebul nekir û mafê axaftinê neda girtiyan. Girtiyan, anîn ziman ku ew dixwazin bi zimanê dayika xwe biparêzin, lê heke pere bidin tercuman tê wateya zimanê dayika xwe bi pere diaxivin û di parastina kurdî de israr kirin. Girtiyên di parastina kurdî de israr dikirin Dadgeriya Înfazê got ku "Heke hûn tirkî neaxivin pereyê tercûmani bidin. Heke êdî neaxivin. Rûnên." û parastina girtiyan asteng kirin. Dadagehê parastina girtiyan negirt û 3 meh cezayê disîplînê erê kir û ji 9 girtiyan jî 100 TL cezayê tercûmanê xebernedayî birî. Li gel girtiyan tercûman nexwastin jî tercûman anîbûn salona dadgehê. Girtiyê di nameyên xwe de wiha gotin: "Pêkutî di nava xwe de a tercûmantiya bi pere astnegkirina mafê parastinê ye. Helwesteke polîtîk e. "

## Recep Tayyîp Erdogan dibêje kurdî serbest e!

**AMED -** Her çiqas Serokwezîr Recep Tayyîp Erdogan di 3'yê îlonê de li Amedê pesnê xwe da û got kurdî û weşanên kurdî serbest in jî, rayedarên Girtîgeha Tîpa E ya Amedê pirtûkên kurdî ên bi bandrol naxe hundir.

Li Tirkiyeyê her çiqas hikûmet û rayedarên dewletê li ser kurdî propoganda bikin jî dîsa bi ceza û pêkanînên li dijî kurdî û weşanên kurdî xuya dibe ku kurdî di rastiyê û fermiyetê de qedexe ye. Her çiqas Serokwezîr Tayyîp Erdogan di 3'yê îlonê de di mîtînga Amedê de bi TRT-6 û weşanên kurdî pesnê xwe da û angaşt ku kurdî serbest e jî, bi girtina Rojnameya Azadiya Welat, Rojev û hilnegirtina pirtûk û rojnamêyên kurdî yên Girtîgeha Tîpa E ya Amedê rastiya hikûmeta AKP'ê baştir zelal bû. Herî dawî çend roj berê Girtiyê bi navê sebahattîn Sumelî yê Girtîgeha Tîpa D a Amedê, ji bo xwendinê çend pirtûkên kurdî ku ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Amedê ve hatine çapkirin şandin girtîgeha Tîpa E ya Amedê. Pirtûkên ku Girtî Sebahattîn Sumelî li Girtîgeha Tîpa D a Amedê, ji girtiya bi navê Sevcan Atak a li Girtîgeha Tîpa E ya Amedê girtî re şand, rastî astengiya rayedarên Girtîgeha Tîpa E ya Amedê hatin. Piştî malbata Atak di hevdîtinê de çûn dîtina keça xwe Sevcan Atak fêr bûn ku hemû weşanêk kurdî li ser wan hatine qedexekirin.

# Suat Aydin hate definkirin

**AMED -** Suat Aydin ê ku di encama êrîşa bi kêr a li dijî Şaredariya Bismîlê pêk hat de birîndar bû, jiyana xwe ji dest da û cenazeyê wî hate defînkirin.

Li navçeya Bismîlê ji ber ku Şaredariya Bismîlê destûr neda ku avahiyekî qaçax bê lêkirin, xwedî û xizmên avahiyê êrîş li xebatkarên şaredariyê kirin û gelek kes bi kêran birîndar kirin. Kesekî bi giranî birîndar bibû jiyan xwe ji dest da. 20 kesên di encama êrîşê de bi birîndar bûyîn 6 kesên reşwa wan giran rakirin Nexweşxaneya Zanîngeha Dîcleyê ya Amedê.

Bavê 6 zarokan Suat Aydin (38) bi merasîmekî girseyî hate defînkirin. Cîgirê hevserokên BDP'ê Demîr Çelîk, serokê BDP'a Amedê Nijad Yaruk, şaredarê Bajarê Mezin a Amedê Osman Baydemîr, şaredara Bismîlê Cemîle Emînoglu, şaredara Licê Fikriye Aytin, şaredarê Surê Abdullah Demîrbaş û rêveberên BDP'ê tevlî merasîmê bûn.

# Êdî li Çambulakê daristan nema

**DÊRSIM / DÎHA -** Ligel biryara KCK'ê ya bêçalakîtiyê li Dêrsimê di nava 10 rojan de li 20 herêman daristan hatin şewitandin û hezar donim darên beruyê şewitîn. Di encama bombebarandinê de şewatên derdikevin bi hinceta "Herêma Ewlehiyê û Qada Mayin" welatî nikarin nêzîk bibin û şewatê vemirînin. Derdorparêzan têkildarî şewata 20 roj in li Çambulakê didome daxuyanî da û wiha gotin: "Çavên te ronî be Tirkiyeyê! Daristana Çambulakê tev şewitî."

Li Dêrsimê di salên dawî de şewatên daristanan derket asta herî jor. Di nava 10 rojan de li 20 herêman şewat derketin û hezar donum Darên Berûyê hatin şewitandin. Daristanên li herêma Alîbogazê, Zozana Bozanê û Çagirê yên navçeya Xozatê ya Dêrsimê hemû hatin şewitandin û sedan hektar daristana berûyê hate şewitandin. Şewat di encama bomberandinê de derdikevin. Şewata li herêma Zarî û Derovayê yên navçeya Qilsê ya Dêrsimê jî piştî 5 rojan bi xwe hate vemirandin. Şewat li gundê Zaxgê ya di encama bombebarandinê de dest pêkir jî aliyê derdorparêzan ve hate vemirandin.

Di şewatan de baxçeyên gundiyan jî zirar dîtin. Şewatên li herêma Geliyê Laç, Babaocagi, Suat û Pilvankê yên girêdayî naveda Dêrsîmê bi xwe vemiriyan. Şewata li gundê Fenecîkê ya navçeya Pilemûriyê di encama operasyona leşkeran dest pê kir hêj didome. Şewata li gundê Zariyê ya Mazgêrdê jî dest pê kirin gihîşt sînorê Çewlîkê. Şewata bi rojane didome ji aliyê gundiyan ve hate vemirandin û gelek qada daristanê şewitî. Li navçeya Pulurê jî ev 10 roj in li herêma Çambulak, Geliyê Munzûr, Hanuşagi, Mercan û gundê Venkê didome û 500 hektara qada daristana darên Berûyê şewitî. Şewata li herêma Hanuşagi û Çambulakê didome, daristana li derdorên qereqolên cendermeyan a Hanuşagi û Çambulakê bi temamî hate şewitandin. Welatî ji ber ku herêmên qereqolê "Qada Mayin" e nikarin mudaxeleyê li şewatê bikin.



### Keyfa qereqolê di cih de ye

Midûriyeta Şixulê Daristanê her sal di demsala havinî de 30 karker dida xebitandin. Lê îsal karker nedan xebitandin. Derdorparêzan, bertek nîşanî vê yekê da û anîn ziman ku welatiyan bi derfetên xwe daristan vemirandin. Derdorparêzan, anî ziman ku bi taybetî nêzî 400 hektar daristana li dora Qereqola Cendirmeyan a Çambulakê bû xwelî. Berdevkê Aktîvîstên Xwezaya Munzûrê Haydar Çetînkaya, diyar kir ku li herêma Çambulakê kokek dar jî nema û hemû daristan hate şewitandin. Çetînkaya, anî ziman ku daristana 500 salî û darên berû tev bûn xwelî û wiha got "Qereqola Çambulakê bi hinceta ewlehiyê daristanan dişewitîne û xwezayê wêran dike. Di dîroka Dêrsimê de herî zêde îsal daristan şewitîn. Divê rayedar li hemerî vê yekê bêdeng nemînin."

## KURTE NÛÇE

### Êrîşên Arteşa Tirk li Zagrosê didome

BEHDÎNAN

Artêşa Tirk di rojên dawî yên meha Remezanê de jî êrîşên li ser herêmên Medyayê didomîne. Hedefa êrîşa dawî Zagros bû. Navenda Çapemenî û Ragihandina HPG'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku Artêşa Tirk di 5-6'ê îlonê de gundê Şikêbînê yê li Zagrosa ser bi Herêmên Parastinê yên Medyayê ku di bin kontrola HPG'ê de ne topbaran kiriye. Di encama topbarana obûs û hewanan ya Artêşa Tirk ya li ser herêmê de, agir bi herêmê ket.

### Çawişek pispor hate kuştin

DÊRSIM

Gerîlayên Partiya Maoîst Santrala Hidroelektrîk a Dînarê ya li ser Çemê Dînarê tê çêkirin dan ber agir. Li ser bûyerê cendirme çûn cihê bûyerê pevçûn derket. Di encama pevçûnê de çawişekî pispor hate kuştin. Têkildarî pevçûnê de heta niha tu daxuyaniyên fermî nehate dayîn û operasyon bi alîkariyan helîkopteran didome. Hate zanîn ku hêzên taybet sewqî herêmê hatine kirin. Hate hînbûn ku çolterên gundê Filîçê yên di navbera Pulur û Dêrsîmê de dimîne hatiye bomberbarandin.

### Îranê dîsa êrîşê qaçaxgeran kir

SERDEŞT

Hat diyar kirin ku artêşa Îranê 3'yê îlonê li bajarê Serdeşta rojhilatê Kurdistanê êrîşê komek qaçaxger kir. Di encamê de kesê bi navê Ebdula Resûliyan bi dijwarî birîndar bû. Di derbarê tedurîstiya Resûliyan de heta niha tu agahiyek nehatiye dayîn. Hat ragihandin ku leşkerên rejîma Îranê dest danîne li ser amûr û sewalên qaçaxgeran jî. Tenê ji destpêka meha tebaxê ve herî kêm 6 qaçaxgerên kurd ji aliyê leşkerên Îranê ve hatin kuştin. Li gorî qeydên ANF'ê ji serê salê ve herî kêm 40 qaçaxger hatin qetilkirin.

### Li Diyanayê keçek 20 salî întihar kir

QENDÎL

Li Diyanaya başûrê Kurdistanê keçek 20 salî ji ber tundiya di nava malbatê de agir berda canê xwe û dawî li jiyana xwe anî. Li taxa Badilya ya Diyanayê keça ciwan a bi navê Nazdar Rehman ya 20 salî di van rojên dawî de agir berda canê xwe û dawî li jiyana xwe anî. Ji ber pêkutiyên malbatê destê nazdarê dişkê. Nazdara bi dijwarî û tundiya malbatê re rû bi rû mayî xwe dişewitîne.


www.arsivakurd.org

# Di demekê nêzîk de konferans dê çê bibe

Heyeta BDP û KCD'ê piştî serlêdana Başûr û pêkhatina hevdîtinan vegeriyan. Hevserokê KCD'ê Ahmet Turk diyar kir niha bingeha konferansek kurd tê avêtin û bawer dikin ku dê di demek nêzîk de konferansê pêk bînin

ABDÛLAH RAMAZAN/SERBAZ SIYAMEND - HEWLÊR / DÎHA

Heyeta BDP û KCD'ê di bin serokatiya Ahmet Turk de di 5'ê îlonê de hatin Herêma Kurdistana Federal. Heyetê li vir bi serokomarê Iraqê Celal Talabanî û gelek derdorên din re civîn pêk anîn. Turk, encamên civîn û amadekariyên konfaranseke kurd anî ziman û diyar kir di demek kin de gelek gavên girîng hatin avêtin. Turk, da zanîn ku li aliyekî KCK'ê agirbest heya 20'ê îlonê îlan kiriye, li aliyekî diyaloga di nava kurdan de a ji bo avakirina aştî û yekitiya kurdan gelek girîng e. Turk derbirî ku demek e ji bo avakirina konferansa kurd xebatê dimeşînin û



bawer dikin ku dê di demek nêzîk de ev konferans pêk bê.

**'Yekitiya ramanê girîng e'**

Turk, destnîşan kir heta diyalogek û yekitiya ziman û ramanê di nava kurdan de ava nebe, nikarin bi derveyî kurdan re diyalogê bikin û wiha got: "Ji bo em biratiya gelan pêş bixin, divê di serî de em yekitiya kurdan ava bikin. Yekitiya ziman, raman û hişmendiyê pêş bixin.

Turk, da zanîn ku ji bo hin gavên erênî bê avêtin pêdivî bi konferansa kurd heye û wiha axivî: "Dê hemû partî, sazî, dezgeh û komeleyên kurd beşdarî konferansê bibin û li ser pirsgirêk û çareseriya pirsgirêka kurd niqaşê bimeşînin. Ji bo her perçeyekî kurdistanê dê pirsgirêk bê tespîtkirin û çareseriya wê bê nîqaşkirin. Ji bo vê yekê jî konferans ferz e. Niha nîqaşên me yên pêkanîna konferansê didomin. Ji bo avakirina projeya xweseriya demokratîk ev lazim e. Em dixwazin pêşniyar û daxwazên partî û saziyan li vir nîqaş bikin û bikin biryar."

Hevserokê KCD'ê Turk, di derbarê naverok civîn û ziyaretan de jî agahî dan û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Di hemû hevdîtinên me de daxwaza hemû partî û aliyên siyasî ya konferansê derket holê. Lê li ser dîroka konferansê û warê konferansê de tiştek zelal nebû. Her kes erênî li konferansê dinere." Turk, bilêv kir ku pirsgirêkên herêmê bi Bexda û welatên cîran re jî hene û wiha berdewam kir: "Başûrî jî dixwazin di demekê kin de konferans pêk bê ku şert û zirûfê wan jî hinekî baştir bibe."

**Di demek nêzîk de**

Hevserokê KCD'ê Ahmet Turk, anî ziman ku hemû hevdîtinên wan erênî derbas bûne û li gorî hevdîtinan bawer dike ku dê di demek nêzîk de konferans pêk bê. Turk, destnîşan kir ku xebatên konferansê hatiye merheleyekê ku kes nikare bibêje konferans çê nebe û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Temamê sazî û dezgehên kurdan dibêjin pêwîst e konferansek kurdan çê bibe. Xebatên me li ser vê yekê didomin. Ez bawer im ev dem zêde dirêj nabe."

## Heyeta KCD û BDP'ê ji başûrê Kurdistanê vegeriya Tirkiyeyê

**HEWLÊR -** Heyeta BDP û KCD'ê piştî li Herema Federal a Kurdistanê bi nûnerên partiyên siyasî û saziyên civaki yên sivîl re hevdîtin pêk anîn vegeriya Tirkiyeyê.

Heyeta BDP-KCD ku 5'ê îlonê habitû Başûrê Kurdistanê piştî hevdîtina bi Serokomarê Iraqê Celal Telebanî re, pêr derbasî Hewlêrê bû. Heyeta BDP-KCD'ê ya ji hevserokên KCD'ê Ehmed Turk û Aysel Tugluk, Cîgirê Serokê Koma BDP'ê Bengî Yildiz, Parlamenterê BDP'ê yê Mûşê Sirri Sakik, nûnerê BDP'ê yê Hewlêrê Rûşen Mahmutoglu û nivîskar Altan Tan pêk dihat. Piştî serdana xwe ya li Silêmaniyê derbasî Hewlêrê bûn.

Heyeta ku bi armanca lidarxistina konferansa netewî ya kurdan û ji bo nîqaşkirina çareseriya pirsgirêka kurd ya li Bakûrê Kurdistanê û biryara bêçalakîtiyê ya KCK'ê hatibû Başûrê Kurdistanê, du li Hewlêrê bi PÇDK, Hizbî Zehmet Kêşan, rewşembîrê kurd Felakedîn Kakeyî re hevdîtin pêk anî. Heyetê îro ji bi Wezîrê Navxweyî yê Herêma Kurdistan Kerîm Sincarî re hevdîtin pêk anîn. Hat ragihandin ku di hevdîtinan de li ser lidarxistina konferansa neteweyî ya kurd, biryara bêçalakîtiya KCK'ê, çareseriya aştiyane ya pirsgirêka kurd û têkiliyên hêzên kurd nîqaş kirine. Heyet BDP-KCD'ê piştî hevdîtina xwe ya bi Wezîrê Navxweyî yê Herêma Kurdistanê Kerîm Sincarî re ji başûrê Kurdistanê birê ketin û derbasî Tirkiyeyê bûn.

## Ocalan bi xwişka xwe re hevdîtina rû bi rû pêk anî

**BURSA -** Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, bi munesebeta cejnê bi xwişka xwe Fatma Ocalan re hevdîtina rû bi rû pêk anî.

Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, bi munesebeta cejnê bi xwişka xwe Fatma Ocalan re duh hevdîtina rû bi rû pêk anî. Xwişka Ocalan Fatma Ocalan û malbatên girtiyên bi navê Cumali Karasu û Bayram Kayzam ji bo biçin Grava Îmraliyê hatin navçeya Gemlîkê ya Bursayê. Xwişka Ocalan, Fatma Ocalan piştî muameleyên li Fermandariya Cendirmeyan a Gemlîkê ji lîmana Gemportê çû Îmraliyê. Fatma Ocalan, piştî hevdîtina xwe ya rû bi rû bi birayê xwe Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan re pêk anî ji giravê vegeriya.



## 'Walî heyiyên dewletê pêşkêşî AKP'ê dike'

**AMED -** Endamên Meclisa Giştî ya Bajar a Amedê, diyar kirin ku Waliyê Amedê Mustafa Toprak û Sekreteriya Giştî ya Walîtiyê heyiyên dewletê pêşkêşî AKP'ê dikin.

Endamên Meclisa Giştî ji bo balê bikşîne ser pirsgirêkên li Walîtiya Amedê pêk tên, li ber Îdareya Taybet a Bajar daxuyanî da çapemeniyê. Li ser navê endamên Meclîsa Bajar Serokê Meclisa Giştî ya Bajar Semra Azîzoglu, diyar kir ku li gorî xala 9'an a hejmar 5302'yan Meclisa Giştî ya Bajar dikare biryara herî jor bide û wiha got: "Meclisa Bajar a Giştî xwedî merciya herî mezin e. Biryarê ku Meclis bigire Walî û Sekreteryaya Walîtiyê neçar e pêk bîne. Lê mixabin Walî û Sekreteryaya Walîtiyê wesatiyên Îdareya Taybet a Bajar û amûrên Îdareyê li gorî daxwaz û armanca AKP'ê bikar tînin."

Azîzoglu, anî ziman ku Walî Mustafa Toprak wekî Waliyê OHAL'ê tev digere û daxwazên xwe wekî emir bikar tîne. Azîzoglu, da zanîn ku Walîtiyê avakirina dibistana gundê Çavundurê ya li ser riya Licê asteng kir. Ligel Meclisa Bajar biryar da jî Walîtiyê biryar vala derxist. Azîzoglu, destnîşan kir ku Walîtî xebatên rêyan jî asteng dike û amûr û wesatiyên Îdareya Taybet a Bajêr li gorî daxwazên xwe û AKP'ê bikar tîne. Azîzoglu, da zanîn ku ew li hemberî van pêkanînên walîtiyê bêdeng namînin.

## Divê dewlet vîna gelê kurd muxatap bigire

**AMED -** Serokê Lijneya Rêveber a Komeleya Nivîskarên Kurd Mehmet Devîren, diyar kir ku divê dewlet vîna gelê kurd muxatab bigire. Devîren, xwest ku ji bo çareseriyaê riyên muzekere û diyalogê bên vekirin.

Komeleya Nivîskarên Kurd, têkildarî bêçalakîtiya PKK'ê û referandûmê li avahiya komeleyê civîna çapemeniyê li dar xist. Serokê Lijneya Rêveber a Komeleya Nivîskarên Kurd Mehmet Devîren, anî ziman ku KCK'ê di 13'ê tebaxê de biryar bêçalaktiyê girt û lê niqaşên tên kirin aliyê kurd nayê dîtin. Devîren, destnîşan kir ku niqaş di navbera hinek teorsiyenan de tê kirin û wiha got: "Tu nivîskar û rewşenbîrên kurd nehatin dîtin. Mixabin operasyonan dom kir. Hêzên taybet li ser sînorên Kurdistanê hatin bi cih kirin."

Mehmet Devîren, da zanîn ku di nîqaşên têkildarî referandûmê kurd nayên ditîn û wiha axivî: "Dema ku serokwezîr hate Amedê mizgîniya girtîgehekê din da. Ev yek me nivîskar û rewşenbîrên kurd dixe nava fikaran. Gelê li vê erdîngariyê ji bo azadiyê tu tişt nayên guhertin." Mehmet Devîran, bilêv kir ku ji bo kurdan encama referandûmê ne riyên diyalog û muzekereyê yên ji bo çareseriya pirsgirêka kurd girîng in û wiha axaftina xwe berdevam kir: "Dengê wijdana me dibêje 'gelê kurd modelekî çawa dixwaze.' Encama referandûmê çi bibe ya giring ji bo gelê kurd çareseriya pirsgirêka kurd e. Divê riyên muzekere û diyalogê bên vekirin."

Mehmet Devîren, destnîşan kir ku ew wekî Komeleya Nivîskarên Kurd çi bikeve ser milê wan amade ne bikin. Devîren herî dawî Cejna Remezanê li hemû gelan pîroz kir.

## KÎK: Divê kurd boykot bikin

Biryara 'boykot'ê ji aliyê Îslamiyên Herêma Kurdistanê jî rastî eleqeyek mezin hat. Serokê Komeleya Îslamî Kurdistan (KÎK) Alî Bapîr, diyar kir ku ew matmayî dimîne ku heta niha Tirkiye çawa bi van zagonan ve bi rêve çûye. Bapîr, anî ziman ku li Tirkiyeyê tenê tirk tune ne û gelek neteweyên din jî hene."

Piştgiriya biryara boykotê li Herêma Kurdistana Federal jî zêde dibe. Serokê KÎK'ê Alî Bapîr, diyar kir ger kurd vê makezagonê erê bikin dê di pêşerojê de zirarê bidin xwe û kurd xwedî maf in ku referandûmê boykot bikin.

**Boykot biryarek pîroz e**

Bapîr, xwest ku zagona bingehîn a Tirkiye yê bi temamî bê guhartin û wiha got: " Ez matmayî dimînim ku çima heya niha li Tirkiyeyê hin xal di zagonê bingehîn de tên hiştin. Ev zagon li dûr î aqilan e. Herkes vê yekê dizane li Tirkiye yê tenê tirk najîn. Her wiha li Tirkiyeyê kurd, ereb, çerkez, gurcî, hemşîn û gelek miletên din dijîn. Nêzî 20 milyon kurd hene. Li gel vê rastiyê çawa dibêjin yek ziman, yek netewe û yek al. Divê di vê referandûmê de ev xal bên guhertin." Bapîr, piştgirî da biryara BDP'ê ya boykotê û anî ziman ku ev biryarek pîroz û mafdar e.



## Li Amedê 5 kes hatin girtin

**AMED -** Li Amedê 5 kesên têkildarî bûyera şerê 2 malbatan û kuştina polîsê ketibû navbera şerê malbatan, hatibûn binçavkirin, hatin girtin.

Li gorî daxuyaniya Waltiya Amedê di 28'ê tebaxê de polîsê bi navê Ozkan Yigen ê ku di encama şerê navbera 2 malbatan de birîndar bûbû û li nexweşxaneyê jiyana xwe ji desta, lêpirsîn hatibûn destpêkirin.

Di encama lêpirsînê de 5 kes hatin girtin. Di daxuyaniya Walîtiya Amedê de hate diyarkirin ku 5 kesên li gundê Dokuz Çeltîkê bi çeka nêçîrê û tebanceyekê ya di dema bûyerê de bikaranîn re hatin girtin.

Di daxuyaniya walîtiyê de hate diyarkirin ku 5 kesên hatin binçavkirin hatin girtin.

## Saziyên sivîl xwestin girtiyê nexweş bê berdan

**STENBOL -** Ji bo girtiyê bi navê Bekîr Şîmşek ê bi nexweşê Wernîcke Korsîkoff ku li Girtîgeha Tîpa F ya Edîrneyê tê girtin bê berdan, ji Wezareta Dadê û Saziya Tiba Edlî re faks hatin şandin.

Rêxistinên civakî yên sivîl ên di nav de Komeleya Hiqûqnasên Hemdem (ÇHD), Emek Sen, Komeleya Çandê ya Divrîgî, Kovara Partîzan û Platforma Şaxên KESK'ê jî hebûn, ji bo ku balê bikişînin ser rewşa girtiyê bi navê Bekîr Şîmşek ê bi nexweşiya Wernîcke Korsîkoff e û di Girtîgeha Tîpa F ya Edîrneyê de tê girtin, li Qada Galatasarayê hatin cem hev.

Rêvebara ÇHD'a Stenbolê Oya Aslan, diyar kir ku li gorî agahiyên Midûriyeta Giştî ya Girtîgehan a Wezareta Dadê, di nava 10 salên dawî de hezar û 659 girtiyan, di girtîgehan de jiyana xwe ji dest daye. Aslan, der birî ku Wezarete Dadê ji van mirinan 130 mirin wekî "Bi ecela xwe mirine" diyar kiriye û wiha pirsî: "Gelo Guler Zere û Abdullah Akçay bi ecela xwe mirin? Hûn Bekîr Şîmşek, jî ji bo ku bi ecela xwe bimire bernadin?" Aslan, ragihand ku Şîmşek nexweşê Wernîcke Korsikoffe ye û da zanîn ku ji ber Saziya Tiba Edlî raporê nade, ew nayê tehliyekirin. Ji bo Şîmşek bê berdan ji Postexaneya Galatasarayê ji Wezareta Dadê û Saziya Tiba Edlî re faks hate şandin.

www.arsivakurd.org

# Boykot li dijî înkar û îmhayê serhildan e

Hevserokê BDP'ê Demîrtaş diyar kir ku boykot li dijî înkar û îmhayê serhildan e û êdî xapandin, taloqkirin nayê qebûlkirin. Demîrtaş got ji bo dev ji boykotê berdin zextên dijexlaqî hatiye meşandin



**ENQERE** - Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş anî ziman ku di xebatên referandûmê de derketiye holê ku hêviya 'Kurd BDP'ê guhdar nakin û em dikarin wan li gorî dilê xwe bi rêve bibin' serneketiye û Demîrtaş wiha got: "Li dijî me zextên ku neyê bîra mirov meşandin. Me heta niha ev aşkera nekir lê dive ku em piştî referandûmê aşkera bikin." Demîrtaş hişyar kir ku kurd ji pergalê dûr dikevin û wiha got: "Sekna boykotê ya kurdan li dijî polîtîkayên îmha û înkarê yên TC'ê yên 80 salî serhildaneke siyasî ye."

Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş bilêv kir ku di serî de heta niha AKP, CHP û MHP'ê li dijî wan bûne yek û ji bo biryara boykotê paş bixin ketine nav hewldanan. Demîrtaş diyar kir ku îro boykot ketiye rojeva Tirkiyeyê û wiha pê de çû: "Biryara boykotê biryareke min eleqedar nake nîn e. Li dijî vê li gorî erê û na daxwazên siyasî yên bi hêz hene. Zihniyeta her du sê partiyan jî heman e û bi heman referansê diaxivin û di polîtîkayên neçareseriyê de israr dikin. Ji bo vê yekê boykot bû teşhîr. Di pêşengişa gelê kurd de eniya boykotê bû hêviyek û gel dît ku ne mecbûr in biryara erê an jî na bidin. Ji ber vê yekê girîng e." Demîrtaş da zanîn ku mebesta wan ew e ku piştî 12'î îlonê vîna çareseriyê derkeve holê.

Demîrtaş diyar kir ku bi boykotê ve lêpirsîna rejîma Tirkiyeyê pêk hatiye û wiha axivî: "Kurd tenê guhertina makezagonê û AKP'ê boykot nakin. Gelê kurd pergala ku ji sala 1924'an heta niha kurdan wekî kole dibîne boykot dikin. Ji vê pergalê diqetin. Dibêjin ger ev pergal me nasneke em jî vê pergalê nasnakin. Sekna boykotê ya kurdan li dijî polîtîkayên îmha û înkarê yên TC'ê yên 80 salî serhildaneke siyasî ye. Ji vê saetê şûn ve êdî xapandin, taloqkirin ji aliyê ve me nayê qebûlkirin. Kurd bi têkoşîna xwe ya 30 salî ve li dijî polîtîkayên fermî yên 80 salin didome îradeya xwe derdixin holê. Ji bo mînaka gelekî ku bi hev re tevdigerin mînakeke girîng e. "

Demîrtaş sekna hîn rewşenbîrên kurd jî rexne kir û wiha got: "Ji bo me rexneya hûn di daxwazên xwe de li gorî demê tevnagerin tê kirin. Yên ku vê yekê dibêjin yên ku kurdan wekî îradeya siyasî nabînin û di bin bandora kurd nikarin ji serê xwe biryarê bidin in. Dibêjin hûnê daxwazên xwe vebêjin lê kengê me destur da. Ji xwe em vê zihniyetê boykot dikin."

Demîrtaş bilêv kir ku ji bo ku dev ji biryara boykotê berdin rêbazên li dijî exlaqê ceribandine û wiha got: Li dijî me zextên ku neyê bîra mirov meşandin. Me heta niha ev aşkera nekir lê dive ku em piştî referandûmê aşkera bikin. Rêbazên li dijî exlaqê hatin ceribandin, zextên siyasî li ser me meşandin, zextên ewlehiyê li ser me hatin meşandin û bi riya çapemeniyê bi nûçeyên manîpulatîf ve zext meşandin. Xwestin ku di şexsê BDP'ê de tevgera kurdan bibe dûvikê AKP'ê." Demîrtaş diyar kir ku hêviya ku taban BDP'ê guhdar nake hêviyeke vala ye û wiha got: "Dixwazin bi şikandina biryara boykotê ve hem BDP'ê tasfiye bikin û hem jî dengê kurdan bigirin. Lê dîtin ku ev tevger û gel bûye yek. Ev partî li otelên luks nehatiya avakirin, gel ev partî avakiriye. Dibe ku hinek derdor me fêm nekin lê gel me baş fêm dike. Gel baş dizane ku AKP partiya dewletê ye û hemû derfetên dewletê ji bo xwe bi kar tîne. Ger li dijî me partiyeke din biryara boykotê bigirta teqez rastî van pêkanînan ne dihat. Ji ber ku ev gel gelekî bi rêxistinkirî ye gel û partî li dûrî hev nîn in. Ji xwe me li gorî daxwaza gel biryareke wiha girt. Îro roja hesabê dîtina rejîma 80 salî ya zîhniyeta yektî û asîmîlasyonê ye."

Demîrtaş anî ziman ku ji bo dirêjkirina biryara bêçalaktiyê divê AKP bi PKK'ê re hevdîtin çêbikin û bi Ocalan re muzakere pêk bên.

Adil Zozanî
adilzozani@gmail.com



## Qedera 4 parçeyan bû yek

Heyeta KCD û BDP'ê hevdîtinên xwe yên bi siyasetmedarên Herêma Federal a Kurdistanê re pêk anîn û vegeriyan.

Serokê Heyetê û Hevserokê KCD'ê Ahmet Turk piştî hevdîtinan daxuyaniyek da çapemeniyê û got ku bingehê konferansa neteweyî ava bûye.

Ji vê peyamê tişta bê fêmkirin ew e ku siyaseta kurd li çar parçeyên welat gav bi gav ber bi avakariya yekitiyeke neteweyî ve diçin û ev jî dê jênegerên gelê kurd ên neteweyî derbixe holê.

Cihê kêfxweşiyê ye ku siyaseta kurd li çar parçeyên welat fêmkiriye ku qedera gelê kurd, ku welatê wî hatiye parkirin bi hev re girêdayî ye.

Ango;

Ji peymana Qesr-î Şîrînê heta niha yekemîn car e ku gelê kurd di qonaxa serxwebûnê de ev qas nêzî hev bûye.

Gelê kurd; li kîjan parçeyê welat bijî bila bijî têgihîştiye ku çareserî hevpar e. Ligel ku li çar parçeyên welat rêbazên çareseriyê li gorî şert û mercên xwe yên taybet pêk bê jî; ev rastî naguhere. Qedera gelê kurd bi hev re girêdayî ye.

Di vê kêliyê de bi taybetî barekî giran dikeve ser milê gelê me yê li Başûrê welat dijî. Her wiha siyaseta kurd a tasarufê li ser pêşeroja gelê Başûr dike jî di vê kêliyê de ketiye ber barekî giran.

Serdema çareseriya li gorî suxletên parçeyan dihate fikirîn bi dawî bû. Siyaseta kurd jî ji niha şûnde qalmecal e ku polîtîkayeke ji gorî çareseriyeke hevpar bide ber xwe.

Ji ber hindê jî konferansa neteweyî ya ku bi salan e li Bakurê welat dihate dabaşekirin, êdî ketiye rojava siyaseta kurd a parçeyên din ên welat jî.

Ji vê qonaxê şûnde, ewilê divê nexşeriyek bê danîn. Siyaseta kurd nexşeriya konferansa neteweyî divê dabaşe bike. Lewre; biryardariya ji bo konferansê bitena serê xwe girîng e lê ne her tişt e. Heke nexşeriyeke ji bo konferansê neyê destnîşankirin, ev hewldan dê bikeve zorê. Gelek hêzên ku dixwazin zeviya kurdan bikin şov hene. Taybet; Tirkiye Îran û Sûriye ji bo ku yekitiya kurdan ava nebe, hemû rêbazan ji xwe re mûbah dibînin. Di serî de Tirkiye niha dixwazin li Iraqê şiî û suniyên ereb jî bidin ligel xwe û eniyeke çaralî li hemberî yekitiya neteweyî ya kurdan ava bikin.

Ji bo ku piştrast bibin, zêde dûr neçin beriya 6 mehan li Iraqa Federal hilbijartinên giştî pêk hatin. Lê ligel ku 6 meh derbas bûn hê jî hikûmeta navendî nehatiye avakirin.

Sedemê neava hikûmeta navendî ya Iraqê yekser pirsgirêka kurd e. Bizavên kurdan ên ji bo avakariya yekitiya neteweyî ji bo Tirkiye, Îran û Sûriyeyê hinceta tevlihevkirina Iraqê ye. Ev hêz dixwazin hevpariya hêzên Başûr a di nava rayedariya Iraqê de daxin asta herî kêm. Ji ber hindê jî divê di navbera hêzên Başûr û erebên şiî û sunî de nakotiyan derbixin holê. Miraza wan ew e ku piştî xwe vekişandina leşkerên Amerîkayê ji Iraqê başûrê Kurdistanê ji çar aliyan ve dorpêç bikin û bifetisînin.

Lewre; gelê kurd li Başûr zêdetirî 20 salan e di rewşeke 'de-facto' de dijî û xwe birêvedibe. Cerebeyek çêbû.

Û niha em hatine asteke wisa ku mûşterekên parvekerên welatê me jî bûne yek. Her çar dewletên ku erdnîgariya me di navbera xwe de parkiriye; li gorî konsensûsekê nêzî me dibin. Li hemberî wan divê konsensûseke me jî ya hevpar hebe. Konferansa neteweyî ji bo avasaziya vê konsensûsê gaveke.

Ango, dewra li gorî xwe fikirînê dawî bû. Niha dema hişmendiyeke hevpar a neteweyî ye.

## Rêxistinên Bedlîsê gotin 'Boykot'

**BEDLÎS** - 20 rêxistinên civakî yên sivîl ên Bedlîsê daxuyaniyek hevbeş dan û diyar kirin ku naçin ser sindoqê û dê bêjin 'Boykot'

Li Bedlîsê, 20 rêxistinên civakî yên sivîl ên di navde Egîtîm Sen, SES, DÎSK, Tum Bel-Sen, BES, Enerjî Yapi-Yol Sen, BTS, Kultur Sanat Sen, Haber-Sen, DÎVES, ESM, KURDÎ-DER, MEYA-DER, Meclîsa Bajar a Tetwanê û Tarim Orman-Sen jî hene, têkildarî boykotkirina referandûma 12'ê îlonê li avahiya KESK'ê ya li Tetwanê civînek çapemeniyê li dar xist in. Nûnerê Egîtîm Sen'ê yê Tetwanê Yuksel Ozan, li ser navê saziyan daxuyand ku ji bo tesîrê li vîna gel bikin gelek amurên propogadayê tên bikanîn û da zanîn ku ew wekî rêxistinên civaka sivîl di referandûme de dê bêjin 'Boykot'. Nûnerên rêxistinan, piştî daxuyaniyê, broşurên boykotê li esnafan belav kir.

## Li Mûşê belavok hate belavkirin

**MÛŞ** - BDP'a Mûşê, di çavçoveya xebatên boykotê de belavok belav kirin.

BDP'a Mûşê, di çarçoveya xebatên referandûmê de esanfên Bajaroka Altinovayê ziyaret kirin û belavok belav kirin. Serokê BDP'a Mûşê Nîmet Sezgîn, endamên Meclîsa Giştî, Şaredarê Altinovayê Bahattîn Bahadir û rêveberên BDP'ê yên Altinovayê li bajarokê belavok belavkirin û rastî eleqeyekî mezin hatin.

## Li her derê xebatên boykotê

BDP, xebatên xwe yên di çarçoveya boykotê de li Mêrdîn, Sêrt, Êlih û Rihayê bi civînan didomîne.

**MÊRDÎN:** BDP'ê li taxên Îstasyon û Kotekê, Bajaroka Misûriyê û gundên Tilşirê û Qesra Qelenderayê civînên gel lidarxistin. Parlementer Emîne Ayna, rêveberên û endamên BDP'ê û gelek kes beşdar bûn. Civînên heyata BDP'ê tevli dibin vedigerin mîtîngê û peymana dê sindoqên vala rêbikin da. Parlamentera BDP'ê Emîne Ayna diyar kir ku dê di 12'ê îlonê de dê 25 madeyên makezagonê bên erê kirin û wiha got: "Duh Kenan Evren jî digot yek netew yek ziman. Îromî Erdogan heman tişt dibêje. Em înkarê boykot dikin." Ayna axaftina Serokwezîr a têkildarî Apê Mûsa de li Amedê kirin nirxand û wiha axivî: "Ape Mûsa baş dizane. Ji ber ku Apê Musa baş dizane ku têkoşîna wî ya ziman, nasname û azadiyê înkar dike. Çima Apê Mûsa hate qatilkirin. Ji ber ku daxwaza azadiya ziman û nasnameya xwe kir hate qetilkirin. Tu Mûsa Anter dinasi. Ape Mûsa êşa me ye, kezeba me ye. "

**SILOPÎ:** Şaredariya Silopiyê jî li Parka Yeşîltepeyê xwarina fitarê da esnafên Silopiyê. Şaredarê Silopiyê Emîn Togurlu, Serokê BDP'ê yê Navçeyê Bahattîn Alkiş, endamên Meclîsên Şaredariyê û gelek esnaf jî beşdar bûn. Şaredarê Silopiyê Emîn Togurlu, diyar kir ku meha Remezanê meha biratiyê û dostaniyê ye. Togurlu, ji esnafan xwest ku 12'ê Îlonê referandûmê boykot bikin.

**ÊLIH:** BDP'a Êlihê, bi tevlibûna Hevserokên BDP'ê yên Êlihê Saadet Becerîklî, Şehmus Aslan, Serokê BDP'ê yê Navçeya Navendî Şerîf Çakar ji heyî esnafên sîteya Kaynakciyan û Xeratan geriyan belavok belavkirin. BDP'iyan xwest ku gel roja 12'ê Îlonê neçin ser sindoqan û boykot bikin. Heyeta BDP'ê hatin ber Navenda Çandê ya Biharê ya li Kolana Diyarbakirê. BDP'a Hezoyê li Mala Gel a Şaredariyê xwarina fitarê da jinan. Parlementera BDP'ê Ayla Akat Ata, Hevseroka BDP'a Êlihê Saadet Becerîklî û jinên DOKH'ê tevli civînê bûn.

**RIHA:** Parlamenterê BDP'ê yê Rihayê Îbrahîm Bînîcî, Serokê BDP'a Rihayê Îbrahîm Ayhan, Serokê BDP'a Serêkaniyê Nurullah Akan, Şaredarê Serêkaniyê Îsmail Arslan û endamên meclîsa giştî û şaredariyê jî di nav de li gundên Serêkaniyê geriyan gel ziyaret kirin. Heyeta BDP'ê xwestin referandûmê boykot bikin. Heyeta BDP'ê li gundên Axirtoç û Lebanayê rastî eleqeyekî mezin hatin. Piştî heyetê li gundan vegeriya esnafên Serêkaniyê ziyaret kirin û belavokên boykotê belav kirin.

**SÊRT:** BDP'a Misircê jî di çarçoveya xebatên referandûmê de li Parka Jiyana Jin a Berfînê şahiyek li dar xist. Serokê RBDP'a Misircê Abdulgafur Kubîlay, Şaredarê Misircê Necat Yilmaz û rêveberên BDP'ê û bi sedan kes beşdar bûn. Di şahiyê de slogana "Bijî serok Apo" hate berzkirin. Di axaftinên hatin kirin de hate xwestin bi hêzekî xurt referandûma 12'ê îlonê bê boykot kirin. Her wiha daxwaz makezagonekî nû hate kirin. Piştî axaftinê Koma Zarokên Misicê yekemîn car derket ser dikê û staran gotin.



www.arsivakurdi.org

# Bazara teknîka lazerê kirin

Rûsya û Israîl li ser hevkariya çekan berbihev tên. Herî dawî Putîn û Barak li ser teknîka lazerê ligel hev rûniştin. Heke li hev bikin dê Rûsya lazerê li balafirên Israîlê bar bike

**MOSKOW** - Serokwezîrê Rûsyayê Vladimir Putîn û Wezîrê Parastinê yê Israîlê Ehud Barak hevdîtin kirin û di hevdîtinê de bazara taknîka lazerê hat kirin. Israîl dixwaze Rûsya teknîka xwe ya lazerê monteyê balafirên wan ên şer bike.



Ehud Barak ji bo mohrkirina peymanên hevkariyên leşkerî serdana Rûsyayê pêk anî. Di serdanê de bi Serokwezîrê Rûsyayê Vladimir Putîn re hevdîtin kir. Di hevdîtînên du alî de di çarçoveya mohrkirina peymana herî dawî ya hevkariyên leşkerî de li ser teknîka lazerê rawestiyane. Di hevdîtinê de Putîn axivî. Di axaftina xwe de got ku ew difikirin li balafirên Israîlê teknîka lazerê û tiknîka peşketî yên Rûsyayê bar bikin.

Putîn destnîşan kir ku ew niha jî difikirin li Israîlê beşek şebekeya satalaytê ya Glonass ava bikin. Îstasyona Glonass; îstasyona menzîl dirêj a lazerê ye. Putîn vegot ku di nav Rûsya û Israîlê de ji gelek aliyan ve hekarî heye û asta hevkariya tekînka leşkerî di asteke baş de ye. Ligel hevkariya teknîka leşkerî, hevkariya aboriyê jî di nav geşedaneke bi îskîkrar de li pêş dikeve. Putîn gotina xwe wiha qedan: "Hecma bazirganiyê ya navbera her du welatan gihîştiye asta berya krîzê."

Barak jî di axaftina xwe de li ser hevdîtinên ku di nav Israîl û Filistînê de destpê kiriye rawestiya. Barak got ku Israîl xwedî derfetên mezin e û Israîl dixawze van derfetan bi Fisilistîn û hemû hêzên herêmê re parve bikin. Ku wext û dem bê dê bi Sûriye û Lubnanê re jî parve bikin. Barak destnîşan kir ku ew hewl didin bi awayekî lezgîn ji bo pirsgirêkên nav Israîl û Filistînê çareseriyên polîtîk peyda bikin.

Hevkariya navbera Rûsya û Israîlê herî zêde ji aliyê Îranê ve ji nêz ve tê şopandin. Her ku Rûsya û Israîl, Rûsya û Amerîka nêzî hev dibin Îran di nav hêzên navneteweyî de dikeve zorê. Bi piştgiriya Rûsyayê Amerîka û Israîl hêsantir biryarên xwe yên ambargoyê û biryarên xwe yên li dijî Îarên bidin qebûlkirin, bixin meriyetê û encaman bi dest bixin.

Demên borî de Îranê li ser helwesa Rûsyayê ya li dijî Îranê û hevkariya bi Amerîkayê re ya li ser ambargoya li dijî Îranê bertek nîşan dabûn û diyar kiribûn ku her diçe Rûsya dibe dijberê Îranê.

# Çalakger Hesen Balayî hate girtin

**SAWALAN** – Li Îranê zextên li ser çalakgerên siyasî û sivîl roj bi roj zêdetir dibin. Di vê çarçoveyê de çalakgerê azerî yê bi navê Hesen Balayî ku di heman demê de rêvebirê tîma çiyavan a Gelecekê dikir hate girtin.Li gorî agahiyan, Balayî roja 4'ê îlonê ji aliyê îdareya Îtlatê ve li Parsabad a bajarê Mughan hatiye binçavkirin û piştre ew veguhestine ciyekî ne diyar. Malbata Balayî jî ji ajansa Denê Sawalan re girtina kurê xwe piştrast kir.

Hesen Balayî beriya niha jî meha Tîrmeha sala 2003'yê di dema merasîma Keliha Babek û sala 2006'ê jî piştî çalakiyên nerazîbûna bêrêziya rojnameyên Îraniyan bi karîkaturan li hember gelê azerî kiribûn hatibû binçavkirin.

# Li Fransayê greva mezin

**PARÎS** – Li dijî polîtîkaya 'reforma teqawidiyê' ya hikûmeta Fransayê sendîkayên Fransayê grev li dar xist û ji 2 milyon kesî pirtir beşdarê grevê bûn.

Sendîka dixwazin bi vê grevê zextên li ser hikûmeta Serokomarê Fransayê Nîcolas Sarkozy zêde bikin û paşve gav pê bidin avêtin. Bi vê armancê di sekotara taybet û cemawerî de grev dest pê kirî, memûr û karker daketinin kolanan û bertekên xwe yên li hember polîtîkaya hikûmetê ya li ser teqawidiyê nîşan dan.

Lîderên sendîkayan der barê armanca xwe de daxuyanî dan û diyar kirin ku ew dê bi vê hêza xwe bi hikûmeta Sarkozy paşve gav bidin avêtin. Di greva roja 24'ê hezîranê de jî dijberê 'reforma teqawidiyê' daketibûn kolanan. Di wê çalakiyê de jî bi kêmanî 2 milyon kes tevli grevê bûbûn.

Serokê sendîkaya CFDT'ê Françoîs Chereque daxuyanî da. Di daxuyaniyê de got ku ev çalakî ji ya 24'ê hezîranê girîngtir e û beşdariyê pêk hatî jî di vê hesasyetê de xurtir pêk hat. Chereque destnîşan kir ku ew dê bi vê muxalefeta xwe bi ser bikevin.

Sendîka li dijî zêdekirina salên teqawidê dertên. Tê gotin ku karkerên di cihên giran de dixebitin ji xwe heta temênê tê diyarkirin najîn. Di rewşeke wisa de kes bê ku ji teqawidê derfet bibîne dê bimire.

Serokê Sendîkaya CGT'ê jî Bernard Thîbault Europe bi daxuyaniyek diyar kir ku heke hikûmet tavîz nede û paşve gav neavê je dê çalakiyan bidomînin.

Ji ber çalakiyê Fransa tevizî. Serûseferên bi trên û balafiran jî bador dît û veguheztin rawestiya.

## BÎRANÎN



M.Salîh Bîlen
(Seyîd) 1990

*Hêviyên min hezar*
*sal in dicivin*
*Û xwe di dile min de*
*kom dikin*
*Wekî baye bestaya*
*rengîn*
*Xwe li zinarê*
*singa min dixe*
*Wekî volkanek jî agir*
*Hestên dilê me*
*germ dike*
*Wekî çalakiya*
*şervanên azadiyê*
*Li hember şerê*
*dagirkeran*
*Li ber xwe dide û serî*
*radike hêviya min*

**Li ser navê malbat wî dayika wî Rabîa Bîlen, xwişka wî Neziye Yogurtçu, xwarziyên wî Ersîn, Mahmût, Leyla, Eylem, Şenay, Çekdar, Rezan û Rojhat**

# 'Îran hevkariyê nake'

BRUKSEL - Daîreya Enerjiya Atomê ya Navneteweyî diyar kir ku Îran li ser bernameya xwe ya nukleerî hevkariyê nake û ji bo çavdêran jî astengiyan derdixe. Daîreyê li ser mijarê rapor amede kir û weşand. Di raporê de tê diyarkirin ku agahiyên çavdêrên daîreya wan ji Îranê xwestine nehatine dayîn û pêşî li wan girtine û nehiştine li tesîsê çavderiyeke hêsan pêk bînin.

Li gorî raporê rayedarên Îranê bersiv nedane hewldanên 2 salên dawî yên derbarê bernameya nukleerî.

Daîreya Enerjiya Atomê ya Navneteweyî diyar dike ku Îranê peywirdarê daîreya wan red kiriye û ji ber vê jî xebatên çavdêriyê pêk nehatiye.

Hikûmeta Tehranê kontrola meha hezîranê de du peywirdarên xwedî tecrûbe bi îdiayên ku daxuyaniyê ne rast dane Îranê ew qebûl nekiribû û nehiştibûn bikevin nav sînorên Îranê.

Nûnerê Daîreya Enerjiya Atomê ya Îranê jî daxuyaniyên ku di raporê de hatine vegotin red kir. Berdevkê Qesra Spî diyar kir ku tiştên ku di raporê de tê diyar kirin xetereya mezin e û ew jî ji ber vê bi fikar in. Berdevk vegot ku van agahiyên rapora dawî jî nîşan didin ku Îran ketiye du bidestxistina çeka nûkleerî.

# Putîn dê careke din bibe endam

**MOSKOW** - Serokwezîrê Rûsyayê Vladimir Putîn berya niha du serdem desthilatdarî kiribû. Ligel vê bi daxuyaniyek diyar kir ku ew dê ji bo serokdewletiyê di hilbijartina 2012'an de carek din bibe endam.

Putîn li navenda betlaneya Soçiyê ya li peravê Derya Reş bersiv da pirsên hin rojnameger û akademîsyenan.

Putîn di bersivan de mijara endamtiya xwe ya ji bo serokdewletiyê jî diyar kir û da zanîn ku pêkane ew carek din ji bo bibe serokdewletê Rûsyayê bikeve hilbijartinan.

Putîn diyar kir ku dema hilbijartin nez bibe dê ew û Serokdewletê Rûsyayê Dimitri Medvedev lihev bişêwirin û ji bo Rûsyayê ya baş kîjan be dê di wê çarçoveyê de biryara xwe bidin.

Berya vê jî Putîn û Medvedev lihev kiribûn.

Serokwezîr Putîn vegot ku ew dema vê biryarê bidin dê daxwaza rayagiştî ya Rûsyayê jî li ber çavan bigirin.

Putîn mîneka Serokdewletê berê yê Amerîkayê Franklîn Roosevelt bibîr anî û da zanîn ku Roosevelt jî çar demsal ji bo Amerîkayê serokdewletî kiriye.

# Li Îranê zarok di zorê de ne

**TEHRAN – ANF** - Di demekê de ku karbidestên komara îslamî ya Îranê salane bi sedan milyon dolar serweta xelkê, bi mebesta belavkirina şoreşa 'îslamî' û di bin navê piştgiriya grûbên çekdar de mudaxeleyî kar û barê welatên din dike, rewşa gel li Îranê her ku diçe xeraptir dibe.

Krîz û qeyrana ku niha Îran pê re rû bi rû ye û karbidestên rejîmê înkar dikin, herî bêhtir jî bandorê li zarokan dike. Wêneyên zarokên ku ji naçarî kar dikin ku malpera hikûmetê ya fermî Mehr News belavkirine asta rewşa ku Îran tê de ye radixe ber çavan. Hejmara zarokên temen biçûk ku divabû li gel hemsaliyên xwe li dibistanê bin, lê ji bo debara jiyanê li cadeyan desmala difroşin û di karên giran de têne bikaranîn her ku diçe zêde dibe.

Ev zarokên ku di bin şert û mercên giran de dijîn, gelek caran jî di karên firotina madeyên narkotîk û diziyê de têne bikaranîn. Li gorî rapora Rêxistina Cîhanî ya Kar ILO,

salane 250 milyon zarokên ku temenê wan di navbera 5 û14 salan de ne ji mafên xwe yên zaroktî yên bingehîn bêpar dimînin.

Li gor heman raporê, 120 milyon zarok dikevine bazara kar ku ji sedî 6 li parzemîna Asya, ji sedî 32 li parzemîna Efrîka û ji sedî 7 jî li parzemîna Amerîkaya Latîn e. Li gor peymanên mafê zarokan hemû kesên di bin 18 salî de wekî zarok têne hesibandin.

Li Îranê, zarok ne tenê ji hemû mafên xwe yên bingehîn bêpar têne hiştin, her weha têne bidarvekirin jî.



# Vatîkanê ji bo Aşitiyaniyê bang kir

**VATÎKAN** - Vatîkanê ji bo Îran cezayê recmê yê ji ber îdiaya Sakîne Aşitiyanî zîna kiriye, lê hatiye birîn rake dê Tehranê re bikeve nava têkiliyên dîplomasiyê.

Hat ragihandin ku kurê Aşitiyaniyê ji Papayê Benedîktusê 16'emîn alîkarî xwestiye û Vatîkan jî li ser vê yekê ket nava liv û tevgerê.

Berdevkê Vatîkanê Federico Lombardi diyar kir ku ew rewşa Aşitiyaniyê bi baldarî dişopînin. Lombardi got: "Helwesta dêrê ya li dijî cezayê kuştinê zelal e û dana ber keviran jî cezayê herî dilkevirane ye. Berdevk diyar kir ku hîn ji bo ew bikevin tevgerê pêngaveke fermî nehatiye avêtin û ragihand dibe ku ji bo rizgarkirina Aşitiyanî riyên dîplomatîk bikar bînin.

Jiberiya niha jî Wezîrê Karên Derve yê Îtalyayê Franco Frattînî ji Tehranê xwestibû ku bi merhemet be.

Rêveberiya Tehranê jiber zextên navneteweyî cezayê recmê yê Aşitiyanî dabû paş.

# Li Başûr 50 rafîneriyên neqanûnî dixebitin

**SILÊMANÎ - ANF** - Hat zanîn ku li Herêma Federal a Kurdistanê bi qasî 50 rafîneriyên ne qanûnî kardikin

Rêvebirê Jîngehê yê Silêmaniyê Mihemed Mehwî aşkere kir ku, niha li Başûr zêdetirî 50 rafîneriyên neftê bi awayekî neqanûnî kar dikin û destûra wan jî tune ye.

Mehwî diyar kir ku li Herêma Federal a Kurdistanê tu kargehek heta ku di warê jîngehê de destûra wê neyê dayîn nikare kar bike û wiha pêde çû: "Her kesê ku daxwaza damezirandina kargehekê bike, hata jîngeh aşkera neke ku zirerê nagihîne xwezaya Kurdistanê, hetanî mercên paqijiya jîngehê bicih neyne, rê nayê dayîn ku ew kargeh bê damezirandin."

Herwiha Mehwî aşkera kir ku, niha pirsgirêka wan di warê jîngehê de danîna rafîneriyên nefermî yên neftê ye ku li her sê bajarê Herêma Federal a Kurdistanê bêyî destûr hatine avakirin û got: "Niha 50 rafînerî hene û bi awayekî klasîk û modelê berê kar dikin. Ev jî dibe sedema gemarkirina xwezaya Kurdistanê."

# Ji bo statuyeke nû: BOYKOT

Dema ev destûr û destûra bingehîn a Tirkiyeyê ji aliyê cuntaya faşîst û leşkerî ve hat amadekirin, hemû hêz û însanên çepgir û welatparêzên kurd li dijî derketin û ji gel xwesteka, boykotê kirin

**MEMO ŞAHÎN**



Di 12'ê îlonê de çend xalên makeqanûnê ango qanûna esasî ya Tirkiyeyê ji bo armanca guherandinê, bi riya referandûmê tên ber gel. Ne tenê tirk her wisa kurd jî ketine danûstandinek, mineqeşeyek germ û kûr. Hinek piştgiriya pakêta AKP'ê dikin û dibêjin erê, hinek jî li dijî derdikevin û dibêjin na. Piraniya kurdan jî dibêjin, ev ne karê me ye, em naçin ser sindoqan û makeqanûna tirk boykot dikin.

Yên 'erê' dibêjin AKP û çend kevne kurdên ku haya kesî ji wan nîn in. Yên 'na' dibêjin û li dijî derdikevin jî CHP û MHP ne. Û yên ku dibên ev destûra bingehîn ne ya me ye û li ser înkar û îmhaya kurd û Kurdistanê hatiye damezirandin û ji ber vê jî em boykot dikin BDP û piraniya gelê kurd e.

Ev zagon û destûra bingehîn, qanûna esasî peymanek di navbera dewlet û milletê tirk de ye. Baş an jî xirab, ev karê wan e û ew mesûl in, ne kurd. Ser de jî ev makezagon li ser înkar û îmhaya netewe an jî olên xeynî tirk û îslamê hatiye şidandin. Ev hemû qetliam, kuştin, talan û werankirin li hemberî kurd û Kurdistanê bingeha xwe ji destûrên dewleta tirk digirin.

Dema ev destûr û destûra bingehîn a Tirkiyeyê ji aliyê cuntaya faşîst û leşkerî ve hat amadekirin, hemû hêz û insanên çepgir û welatparêzên kurd li dijî derketin û gazî gel kirin ku di dengdana, referandûma 7'ê Kanûna 1982'yan de vê zagonê boykot bikin. Li bajarên Kurdistanê de hejmara boykotê ji ya Tirkiyeyê bilind derket.

Bi gotinek din kurdên welatparêz li gorî hêza xwe ji bo boykotê xebitîn û dijî zagona faşist derketin.




**Cewhera makeqanûnê nijadperest  e**

Ev zagon û destûra bingehîn a Tirkiyeyê li ser hîmên nijadperestiyê hatiye avakirin. Li hemû cihanê de destûra bingehîn a herî nijadperest û rasîst a tirk e. Ji destpêkê heta dawiyê bîhna nijadperestî û rasîzma tirk jê tê. Her xal li ser berjewendiya neteweya tirk hatiye şidandin û hemû netewe û olên cuda tên înkarkirin.

Li gorî vê destûra bingehîn a Tirkiyeyê kî bibêje li Tirkiyeyê ji xeynî neteweya tirk netewe û gelên din jî dijîn, ev jî xwedî maf û azadî ne, ev wek xayin tên qebûl û cezakirin.

Ev zagon û destûra bingehîn li ser yek dewlet, yek mîllet, yek ziman, yek al û yek ol hatiye damezirandin. Ev jî;

dewleta tirk,
neteweya tirk,
zimanê tirkî,
ala tirk
û ola îslamê ne.

Kî li dijî van derkeve, ew xayin e. Ji ber vê jî Erdogan dibêje: "Kî li dijî vê rastiyê derkeve, cihê wî li Tirkiyeyê nîn e, bila kerem bike biçe."

Ji bona vê jî serokerkan û fermandarê leşkerê tirk Yaşar Buyukanit û Îlker Başbug dibêjin, "kî li dijî yek dewlet, yek mîllet, yek ziman, yek al û yek ol derkeve, ew ne welatiyê esasî ne, ew welatiyê qaşo ne û leşkerê tirk dê li dijî wan şer bike."

Di destûra bingehîn a tirk de ji serî heta dawî pesna îdolojiya kemalizmê û neteweya tirk tên kirin. Guhertina her 3 xalên destpêke hatine qedexe kirin. Hinek yên din jî ev in:

Desthilatdarî û serwerî bê qeyd û şert ya neteweya tirk e (destpêk).

Zimanê dewletê, tirkî ye (xal 3).

Di sîstema perwerdariyê de xeynî tirkî, zimanek din nayê bikaranîn (xal 42).

Yên ku welatiyên Tirkiyeyê ne, hemû tirk in (xal 66).

Sonda parlamenteran li ser hebûn û serweriya neteweya tirk e. (xal 81)

**Guhertin ne esasî ne, kozmetîk in**

Destûra bingehîn, qanûna esasiya Tirkiyeyê ji 177 xalan pêk tê û di roja 7'ê Kanûna 1982'yan de hatiye qebûlkirin. Di nav 28 salên dawî de li ser daxwaza Yekitiya Ewropayê 16 car hind xalên wê hatine guhertin. Bi van 16 pakêtan de heta niha 85 xal hatine guhertin. Ev hemû jî guhertinên ne esasî û bingehîn, lê guhertinên makyajî û kozmetîk bûn.

Yên niha jî wisa ne. Bi peşniyara Hikûmeta AKP'ê  26 xal ji bo guhertinê tên peşniyarkirin. Yên herî girîng pêkhatina dadgeha çavderiya destûra bingehîn (Anayasa Mahkemesî) ya din jî pêkhatina lijneya bilind a dozger û dadgêran e (Hakîmler ve Savcilar Yuksek Kurulu).

Kurd dadgehên tirk gelek baş nasdikin. Ev dadgehên tirk Şêx Saidê Kal, Seyid Riza, lawê wî yê 17 salî bidarve kirin. Ev dadgehên tirk heta niha hemû partiyên legal a kurdan qedexe kirin û ya dawî jî qedexekirina DTP'ê ye.

Bi biryara van dadgehên tirk bi hezaran zarokên kurd hatin girtin, bi hezaran siyasetmedarên kurd di nav salekê de hatin girtin.

Bi biryara wan dadgehên tirk, bi hezaran kujdar û katilên tirk li ser karên xwe ne û qet yek ji wan nehatine mehkûmkirin û girtin.

Ji bona vê jî ev guhertin ji bo kurdan ferq nake, endamên wan dadgehan ji aliyê AKP'ê an jî kemalîstan bên tayînkirin. Herdu alî jî bo dijmintî û neyartiya kurdan di nav lecekê de ne.

Makeqanûnek ku 85 xalên wê hatine guhertin û ji naverok, cewher û qarektera xwe tiştek winda nekiriye, bi 26 xalên kozmetik a Erdogan jî winda nake. Ji ber ku guhertinên bingehîn nîn in, rola neteweya tirk kêm nakin û cewhera wê winda nabe û cih nade neteweyên din. Ne Desteya Ewlekariya Neteweyî ya Tirk (MGK), ne Diyanet, ne Desteya Bilind a Zanîngehan (YOK) û ne jî Saziya Çand, Ziman û Dîrok a Ataturk tên rakirin.

Pêwîst e kurd ji bo makeqanûn û destûrek bingehîn ku kurdan înkar dike û ji bo îmha û qirkirina neteweya kurd hatiye amadekirin, nebin alîgir û bo rewatî û meşruiyeta wê nebin aktor.

**Pêwîst e kurd çi bikin?**

Kurdên ku ev 28 sal in li dijî vê destûra bingehiîn a tirk derdiketin û digotin bîhna faşîzmê tê û nijadperest e, pêwîst e niha jî heman tiştî bikin. Loyalist û aligirên dewleta tirk di nav gelê kurd de tim hebûn. Berê axa, beg û şêxên kurdan bûn. Tevgera kurd ev çîna tirşikçî û duvê dewleta tirk bi têkoşîna 30 salî de pûç û tarûmar kir. Niha hinek bi navê kurditî dixwazin vê valahiyê tijî bikin û ketina lecek loyalistî yê. Bona vê jî civîn li ser civînan çêdikin.

Lê haya wan nîn e ku îtibara wan ev deh, panzdeh sal in ketiye erdê. Hên di nav xewnên 30 sal berê de ne. Haya wan nîn e ku ev keç û xortên kurd, ev zarok û jinên kurd ku her roj di kolanan de liberxwe didin paxavê bi wan naynîn û ne wan nasdikin û ne jî qîmetek didin wan.

Hinek ji wan ji ber dijmintiya PKK'ê kor bûne, aqil û hişê xwe winda kirine. Hinek ji wan bo çend kirûşên tirk xwe firotine û îtîbara xwe avêtine erdê. Hinek jî bo berjewendî, meslehet û kariyek siyasî bûne dûv û alîgirê AKP'ê û rejîma tirk.

Ne hemû, lê hinek ji wan ku dibên "yetmez ama evet", bi eslê xwe û bi gotinek din "yetmez ama yan cebime koy!" dibêjin. Mesele bi kurtayî ev e.

Kurdên ku 12'ê îlonê de biçin ser sindoqan serwerî û desthilatdariya tirk zexm û meşrû dikin. Pêwîst e kurdên welatparêz beşdarî referandûmê nebin; ne bêjin erê, ne jî na û referandûmê boykot bikin û neçin dengdanê.

Ger li 10 bajarên Kurdistanê ji sedî 50 û jor boykot derkeve, ev tê vê mane û wateyê yê ku ev destûr gelê kurd temsîl nake û kurd destûra bingehîn a tirk davejîn ser sergo û çopê; doza zagonek nû, demokratîk û piralî ku li ser hîmên wekheviyê bilind dibe, dikin û ji bo gelê kurd statuyeke nû dixwazin.

# Lewre ew ê aştiyê ne

**WELAT DILKEN**

Têgeha aştiyê di dîroka mirovahiyê de tekane têgeheke ku mirovahiyê di encama, belkî bi hezaran şeran şûnve wekî fêm û asta kamilbûneke xwe derxistibe pêş. Lewre, aştî têgihêştineke watedar û nirxmezin a mirovahiya ku bi hezaran şeran şûnve "şer" bêwate hiştibe, yan jî fêm kiribe ku encam û dawiya her şerî, aştî ye.

Dîsa di encama hezaran şeran de têgeheke din a ku mirovahiyê fêm kiriye jî ew e; ku encam çi dibe bila bibe "serketiyên tu şeran tune ne". Bi awayekî mirovî, destkeftiyên şeran hene, lê serkeftiyên şeran tune ne… Aliyên şer belkî destkeftiyan jî bi dest dixin, belkî destkeftiyên heyî jî ji dest didin jî, lê ku wekî mirovahî binêrî û binirxînî, mirov û mirovahiyê di encama her şerî de wenda kiriye. Û di tu şeran de serkeftina mirovan tunê, ku destkeftî hebin jî.

Yên ku dikarin şer bikin divê karibin aştiyê jî çê bikin. Dawiya her şerî divê aştî be. Şer kuştin û mirin e, şer êş û jan e, şer talan û wêranî ye, şer xirabkirin û hilweşandina avakirinan ye. Û şer, sedema fêmkirin û têgihêştina êş û jan, kuştin û mirinê ye. Û şer, divê di dawiya dawî de ji nû ve avakirin û aştiyeke diyarî aliyên şer bike.

> Gotineke pêşiyê kurdan heye ku dibêje; 'dijminê xwe mîna mêran bikuje, mîna mêran jî şîna wî rake.' Lê ev yek di qarekterê cîranê me de tune, ew tenê tunekirinê dizanin

Ku em dîroka mirovahiyê ya ji şeran têr û tijî mêzedikin em dibînin ku aliyên gelek şeran ew wane di şeran de derxistine û fam kirine.

Mixabin ku, çi encameke xemkêş e. Êşek mezin e, ku di kamilbûna mirovahiyê de cihê şeran diyarker e.

Kurd di navbera sê cînarên ku teqez bi dehan caran di navbera xwe û wan de şer rûdaye de dijîn. Me got ha, divê dawiya her şerî wekî encam, aştî be. Lê ji ber ku yên êrîşkar ne kurd, ew in, kurd heya niha di her şerê xweparastinê de binketî ne. Di şerên ku kurdan, wekî xwe parastin bi ereb, ecem û tirkan re kirî de di destê me de tu qeyd û dokûmanterên ku di navbera kurd û yên hemberî xwe de wekî, lihevhatin, mafdayîn, an mafwergirtin ku radigihînin me tunê ne. Dîsa ku em dîroka mirovahiyê ya şeran mêze dikin em tiştekî din jî dibînin, em dibînin ku kesayetiya aliyê şer yê hêzdar hundirê aştiyê jî tijî û dadigire.

Ku em bala xwe didin wan hersê neteweyên ku bi kurdan re şerên bêmaf û bêdad meşandine, em dibînin ku wan ta roja îroyîn bi tu gelên cîhanê re bi awayekî dadwarî, mafdayinî û rêzgirtinî lihevhatin û aştî pêk neanîne. Di tu qeyd û belgeyên wan û yên cîhanê de nehatiye dîtin ku wan mohra xwe li binê aştiyeke birûmet xistî ye.

Di qerekterê wan de heye, ew bi tenê vayê dizanin, an wê yê hemberî xwe têk bibin û bipelçiqînin û rûmeta wî bişkênin, binpê bikin, an jî ku bi xwe binketin wê solê aliyê ku ew têk birine bialêsin. Xeynî van herdu encaman, heya îro me nediye û nebihîstiye ku wan hersê cîranên me ji şeran encameke din derxistiye û pêk aniye.

A îro kurd ji wan hersê cîranên xwe doza aştiyeke bi rûmet û adil dikin. Ne tenê îro, belkî ji Medan vir ve 2hezar û 500 sal in ku kurd doza lihevhatinê, ya aştiyê û ya cîrantiyeke ji hev re rêzdar û sînorzan dikin.

Lê mixabin ku wekî her hêz û gelê cîhanê, cîranên kurdan ne xwediyê qarekterekî wisa ne, ku bizanibin dawiya her şerî aştî ye, encama her şerî lihevhatinek e, mafdayîn û mafnaskirin û ji hebûna yê hemberî xwe re rêzgirtin e. Mixabin ku ew ji vî qarekterê aliyên ku dizanin şer jî bikin û aştiyê jî çê bikin, bêpar in. A loma divêm, ew ne yê aştiyê ne

Belkî tunebûna bextê kurdan e. Gotineke pêşiyan heye, divê dijminê xwe mîna mêran bikuje, mîna mêran jî şîna wî rake. Lê ew yek di qerekterê cîranê me de tunê, ew tenê tunekirinê dizanin. Li hemberî hêzên cîhanê dibin pîsik û solên wan dialêsin, lê li hemberê kurdan dibin şêr û qirêka me ji hev diçirînin. Ji ber ku kurd ji hev de ketîne û ne hêzek yekgirtîne.

Wekî encam, divê kurd sê tiştan bizanibin.

***1.*** Divê qarekterê dijminê xwe nas bikin.

***2.*** Divê kurd bizanibin û ji bîr nekin, ku hezar sal jî derbas bibin ên bêqarekter ku kêngê derfetê bi dest bixin û ku karibin, dê kurdan di dilopek av de bifetisînin.

***3.*** Divê heke ku kurd dixwazin xwe ji xetereyên van bêqarekteran rizgar bikin, divê belawelabûna xwe ji holê rakin û yekitiya xwe saz bikin.

A belkî hingê em karibin qala aştiyeke dadwarî û birûmet û mayînde bikin.    Ku nebe bila bê zanîn, ku ji kurdan hin şîv bin, ên mayîn paşîv in…



# Hêza azadîxwaz a kurd ne berxik e

Hêza rizgarîxwaz hetanî mafên gelê kurd bi riya makeqanûnê mîsoger nebe, xwe bêçek nake û weke berxikan xwe navêje nav lepên gurên har

FEVZÎ OZMEN

Di van bîst salên dawiyê de cihanê navê şoreşê ji bîr kiriye. Piştî têkçûna sosyalîzma rasteqîn(reel) di destpêka salên 90´î de kapîtalîzma yekalî ya global bandora xwe li ser hemû qadên bîrdozî û rêxistinên sosyalîst û demokrat ên heyî mîsoger kir û hemû qadên bîrdoziyê û baweriyê kirin bin destê xwe. Ji wan salan û pê ve li cihanê hêviyên şoreşê, çi di warê çînî de be, çi di warê neteweyî de be, yeko yeko şikestin.

Rêxistinên ku di vî warî de bi îdia bûn, an ji hev bela bûn, an jî ketin bin bandora kapîtalîzma postmodern.

Her çiqas di vê pêvajoyê de hin rêxistinan hebûnên xwe domandin jî, lê ne di warên leşkerî, ne jî di warên rêzanî, civakî, çandî û bîrdoziyê de pêşketinên berbiçav bi dest xistin.

Li gel van hemû encamên nerênî, dîsa jî em dikarin navê tevgereke awarte bi lêv bikin. Ew jî, Têkoşîna Azadiya Gelê Kurd e.

Têkoşîna Azadiya Gelê Kurd, a di pêşengiya serok û kadroyên nûjen de dimeşe, her çiqas di salên 70´yî de, di dema serweriya cihana dubendî de, bi dûrişmên sosyalîzma rasteqîn derket dika cihanê jî, di salên heştêyî de hêdî hêdî xwe ji bin bandora bîrdozî û stratejiya sosyalîzma rasteqînî dûr xist û bîrdozî, stratejî û rêbazên têkoşîna xwe, li gorî mercên civaka kurd ên navxweyî û mercên Rojhilata Navîn, bi rêk û pêk kir, pişta xwe da xwe, hêza gelê xwe û têkoşîna xwe domand.

Bi vî awayî di vê pêvajoya aloz a ku tê de heroj aliyekî cihanê serobînê hev dibû, de ne tenê bi hebûna xwe li ser piyan ma, di her qadên jiyanê de bihêz bû, geş bû û mezin bû. Di aliyê rêxistinî de li her dera cihanê, li cihên ku Kurd lê bûn, belav bû. Ji gel û civakên bindest re bû çavkaniya hêvî û modeleke nû.

Di hêla leşkerî de, li gel berdêlên giran, serkeftin û lehengiyên bêhempa bi dest xist. Di warên civakî, siyasî, çandî, hunerî de jî hîmên bingehîn yên şoreşeke mayînde danî. Hemû dîwarên tirsê hilweşand. Ji civakeke bêhêvî, tirsonek û mirî; civakeke hêvîdar, wêrek û zindî afirand. Di civaka ku navê jinê tê de nedihat bilevkirin, artêşa jinan a nûjen afirand. Di qada Rojhilata Navîn a paşverû de girseya jinên serhildêr derxist holê.

Navê kurd û Kurdistanê ku di qadên hiqûq û siyaseta cihanê de hatibûn jibîrkirin, ji nû ve dan bihîstin û pejirandin. Di têkoşîna li hember artêşa duyem a NATO´yê û tevahiya hêzên NATO´yê yên leşkerî û yên din, têkneçûna xwe bi cihanê peyitand û da pejirandin. Ji zaroyên bi hatina cendirman dihatin tirsandin, komên zaroyên ji tank û panzeran çavên xwe nakutin, derxist holê.

Ji civaka ku ji ziman û nasnameya xwe şerm dikir û dirêviya, civakeke serbilind hat afirandin...

Heke mirov wan rûdanên ku me li jor rêz kirine bîne ba hev, bi hêsanî dikare bingeha şorêşeke bergehdar û kûr bîbîne. Lê em bala xwe didinê, rayedarên dagirkeran û hevkarên wan, bi ewqas pisborên xwe yên stratejîst, bi çaveke kor li vê rewşê dinêrin û wê nabînin. An jî naxwazin bibînin.

Vê şoreşa gelê kurd a ku ewqas bi êş û azar û berdêlên giran hatiyê pê, dixwazin wek bûyereke terorparêzî bibînin, an jî bidin şanîdan û bi alîkariya hêzên emperyal, bi rêbazên terorîstî tune bikin. Ev helwesta hêzên dagirker tê famkirin.

Ya li vir nayê famkirin, helwestên hin kes û komikên kurdan in.

Hin kurd hene bi gotinên xwe yên bêbingeh serxoş dibin û her şevê Kurdistaneke serbixwe çêdikin. Ew jî bi van gotinên xwe ne bawer in.

Dewlet jî dizane ev gotinên wan pûç û vala ne, lewma naçe ser wan. Jixwe dewlet ji hemû gotinên li ser kurd û kurdayetiyê aciz e. Lê, ji bo ku wan li dij Tevgera Azadîxwaz bi kar bîne, vêga dengê xwe jê re dernayne.

Dewlet dest li pişta wan dixe dibêje: " Hûn kurdên baş in! Pirsgirêkeke me bi we re nîn e!" Ew jî bi devê dewletê diaxivin û vê şoreşa kurd a muhteşem wek dagirkeran pirsgirêkeke terorîstî dibînin. Vê şoreşê di xelekeke deng de dinirxînin. Dixwazin, bêyî ku kevirekî xwe bavêjin, li ser destkeftiyên şoreşê rûnin. "Eger PKK tasfiye bibe, meydan ji me re dimîne." dibêjin. Nizanin PKK nebe, dewlet pûleke xwe jî bi wan nade. Gotineke pêşiyan e.

Dibêjin: "Rovî di siya darê de vedizele, dibêje, siya dêliya min e." Sî sal e, dewlet bi hemû hêzên xwe ve, ne tenê bi hêzên xwe, bi alîkariya dewletên herêmê, bi alîkariya hêzên dewletên NATO´yê û dewletên alîakarê xwe yên din ve diçe ser Têkoşîna Hêzên Rizgariya Kurdistanê. Lê dîsa nikare têk bibe.

Vê hêzê sî sal e, li ber xwe daye û têkoşîn hetanî roja îro aniye. Evqas berdêlên giran dane. Dikeve serê kê, Hêza Rizgarîxwaz hetanî mafên gelê kurd yên bingehîn bi makeqanûnê mîsoger nebe, bi dayîna çanaxekê razî bibe û xwe bêçek bike û weke berxikan xwe bavêje nav lepên guran!..

# Nemrûdên hemdem

MAM DERWÊŞÊ BOTÎ

Ji roja dinya ava bûye heta îro gelek kes rabûne û dem dem doza xwedatiyê kirine. Ji wan kesan çend heb ku em zanin wek Firawun, Nemrûd, Deqnanos û Şeda dema jiyane di nav gel de xwe wek xweda dane nîşandan.

Lê wê demê jî gel nerazîbûna xwe nîşan daye. Em dixwazin bûyerekî ku wê demê bûye bi xwendevanê xwe re parvebikin.

Wekî ku hûn dizanin Nemrûd digot ez jî xweda me (haşa sume haşa) Li ser ew gotina Nemrûd gelê wî jî got ya Nemrûd xwedê kesan diafrîne û rihê kesan distîne, miriyan sax dike. Gelo ew hîkmet û kerametên te heye ku tu doza xwedatiye dikî. Li ser wê yekê Nemrûd wiha bersiv dide.

Belê ew hêza min heye û ez jî bi serê xwe xwedame. Nemrût rojek gelê xwe dide civandin û bi îşareta şûrên xwe ciwakî dike du felq û bang dike û dibêje felqek e wê here malên xwe yên din bên kuştin.

Li ser wê bûyerê li gel ba dikeve û dibêje

-We dît ku mirin û jiyan bi biryara min e ew jî tê wê wateyê ku ez jî xweda me.

Lê mixabin kesên ku ew roj şahidên wê bûyerê bûn tu kes cesaret nîşan neda ku bêje ey Nemrûd tu zilmê dikî. Tu zalim î, ev tiştên tu dikî jî zilm e, di xalikbûnê da tiştên tu dikî tune ye. Ew tişt karên faniya ye û tu jî weke me fanî yî.

Hêza dora te tunebe tu nakî seriyekî sîr. Belê îro jî hinek kes xwe di wî warî de heman tiştî dikin hene. Gelo ew kî ne?

Yên zarokên kurdan dikujin, yên zarokên filistîniya dikujin û yên di cîhanê de çikas zarokên belengaz û neçar hene û wan di bin zilma xwe de diperçiqînên em karin bêjin ku ew Nemrûdê hemdem in.

Gelo Nemrûdên herêma me çi dikin? Nemrûd pêşî (TMK)—(ZAGONA HEMBERÊ TERORÊ) derxist û zarokên ku temenê wan biçûk girtin û cezayên giran li wan birîn û dema li hemberê wê rewşê dengê gel bilind bû neçar man ku wê zagonê betal bikin û ne tev bin jî hinek zarokan dan berdan.

Paşî jî gotin mêze bikin azadbûna wan jî dîlbûna wan jî bi biryara me ye em jî bi dilekî xalis dipirsin. Gelo çi ferqa Nemrûdê berê û yên hemdem heye. Ew roj jî taktîkek bû îro jî eynî ye, sibê jî em bawer dikin dê eynî be. Sibê jî ew ê neviyên me bi teşekî Nemrûd ew ê qala wan kesan bike.

Ji serokê AKP'ê Recep Tayyîp Erdogan re dibêjim gelo çend kes bûye serokwezîr. Bila bên pirsîn û ji wan navên çend kesan zanin bila bê pirsîn em bawer dikin hejmara navên serokwezîran qandî tiliyên destan ancax zanibin.

Ji ber wî em dîsa bi navê mirovatiyê wî şiyar dikin û dibêjin. Tu dixwazî di dilên kurdan de cî bigrî û heta dinya ava be di dilên kurdan da bî pêwîst e tu pêşî dest ji Nemrûdbûnê berdî û daxwazên kurdan bi cî bînî.Tu ne xaliq , tu jî wek me fanî yî, tenê hêz di destê te da heye were wê hêzê di warê zilmê de bi kar neyne,ku sibê nêvîyên te wek Nemrûd li te mêze nekin. Çawa her Nemrûdekî, Brahîmekî wî heye, îro jî li hemberî zilma serdestan, berxwedana Mazlûman jî heye.

Em meha Remezanê ya pîroz li gelê alema îslamê û bi taybetî li gelê kurd pîroz dikin û bila ev meh bibe wesîla aşitîyê.

## Qerf Henek

Zextên li ser çapemeniya kurd




AKP mehkûmê Boykotê ye !..




## XEMLA KURDISTANÊ TU YÎ BOTAN

*Tu pir delal î*
*tu evîna nava dilan î*
*warê şêr û Egîtan î*
*cihê ceng û azadiyê*
*û xemla Kurdîstanê*
*tu yî Botan!*
*Dengê dilê min e*
*xûmexûma çem û rûbarên te*
*ji nava dar û deviyên te*
*tê dengê şalûr û bilbilan*
*ji ser gir û baniyê te*
*qebeqeba kewên gozel tê*
*ji ser lat û zinarên te*
*mexela xezalan û pezkoviyan e*
*zozanên bilind ên dilên me*
*cihê bêrî û bêrîvanan*
*mêrg û çîmenên şîn*
*tu yî ey Botan!*
*Keç û xortên Medan*
*bi eşqa nêrgîz û sosinên te*
*bi eşqa rihan û beybûnên te*
*bi hêrsa te rabûn serxwe*
*û ji bot e kirin dîlan*
*çirûskên agirê Nînovayê*
*bû sê darikên niftikê*
*li zîndana Amedê*
*li qata çaran*
*hucreya nehan pêket*
*agirê Mazlûm!*
*Çaran dest dan hev*
*Bi dilên ji agir!..*
*Egît bû çirûskek*
*û bi nava çiyayên te ket*
*li Cudî û Gebar*
*bû nîşana serxwebûn û azadiyê*
*vê daxwaziya ku bû xelat*
*bi avên Dîcle û Firat*
*belav bû li herçar aliyê welat...*

RAMAZAN ALGAN



www.arsivakurdi.org

# Ji ber ku xelîfe kurd bû xanedana wî ji holê rakirin!

Tê gotin ku Mervanê II'yemîn xelîfeyê dawîn ê Emewiyan e. Diya wî kurd e. Lê li gorî rîwayeteke xelîfeyê dawîn ê Emewiyan ne emewî ye jî. Belkî jî tenê ji ber ku kurd bû xîlafeta wî bi dawî bû

DOGAN BARIŞ ABBASOGLU
AMSTERDAM / ANF

Mervanê II'yemîn ku ne xelîfeyên herî bi nav û deng be jî belkî yek ji wan ê ku nave wî herî zêde tê bilêvkirin e. Bêguman ji yên ku herî zêde tê nîqaşkirin e.

Ji Mervanê II'yemîn ku di navbera salên 744-750 de li ser hikûm bû re xelîfeyê dawîn ê Emewiyan tê gotin. Lê li gorî rîwayetekê xelîfeyê dawîn ê Emewiyan ne emewî ye jî. Diya wî kurd e. Demeke kurt piştî ku diya wî tê qesrê Merwan tê dinyayê. Gelek dîroknasên îslamê îdia dikin ku diya Mervan gava ku hatiye qesrê jixwe ducanî bûye û Mervan ne Emewî ye.

Yanî Mervanê ku em wekî nîvkurd nas dikin belkî jî ji sedî sed kurd bû. Belkî jî tiştekî din bû. Em nizanin. Lê belê di çîroka wî ya ku wê li geliyê Zapê ku li dilê Kurdistanê ye biawayekî dawî bibe de rola guftûgoyên ku ew ne Emewî ye girîng e.

Rojbûna Mervanê ku neviyê xelkîfeyê emewiyan Mervanê II'yemîn nayê zanîn. Tê texmînkirin ku diya wî di sala 691'ê hatiye qesra bavê wî yê ku waliyê Qafqasê bû. Li gorî gelek dîroknasên îslamî diya wî kurd bûye. Qet nebe mîsoger e ku diya Mervan ne ji tu malbatên navdar ê ereban e. tê qebû kirin ku Mervan di sala 692'yan de hatiye dinyayê. Li gorî Al Tabarî jî rojbûna wî 694 yan jî 696 e.

Li gorî rîwayetek din jî jina ku ji aliyê Mihemedê kurê Mervanê I'em Zubayridan hatiye stendin Mervan di nava nivînên Mihemed de aniye dinyayê. Mihemed jina kej û çavşînik kiriye bin hîmayeya xwe û Mervan jî wekî kurê xwe dabû naskirin.

Mervan di civaka îslamî de bi nasnavê "Hîmar al-Cezîrrah" dihate naskirin. Bi wergereke têkûz "Kerê Mezopotamyayê." Nasnavekî ku ne xweş be jî armanca bikaranîna wî ya di wê demê de gelekî cuda ye. Li gorî dîroknasên îslamî ew nasnav ji ber ku Mervan yekî gir û xurt bûye lê hatiye kirin. Li gorî rîwateyeke din jî ji ber ku Mervan ji giyadawidiyê gelekî hez dikir ereben jê re digotin " Hîmar al-Cezîrrah." Tê qalkirin ku gava El Tabarî li Sûriyeyê keleha Ximşê fetih kiriye bi penîsê kerekî heqaret li Mervan kiriye. Ev mînak rastiya nasnavê ku li Mervan hatiye kirin derdixe hole.

Mervan bi taybetiyên xwe yên fizîkî ji selefên xwe cihê bû. Heta ku tu bibêjî yekî bejinbilind bû û eynî mina diya xwe kej û çavşînik bû. Mezinbûna Mervan a wekî emewiyekî li bi saya şerê Ermenistan, Azerbaycan û welatên din ên Qefqesyayê pêk hatiye. Ne tenê wekî leşkerekî wekî rêxistinkarekî jî xwedî meziyetên cidî bûye.

Piştî ku ket dewsa bavê xwe karê wî yê pêşîn rêxistinkirina artêşê bûye. Ji bo ku leşkeran li artêşa xwe zêde bike, bi êlên li Kurdistan û Qefqesyayê re li hev kir. Ligel ermeniyan tifaq ava kir. Dirûvê artêşê ji serî heta binî nû kir. Ji dêvla artêşeke kevneşop û fireh ku yekrêzî bû artêşeke ku bi nave "Kurdûs-Karadûs" bi nav dikir ku ji yekîneyên biçûk ên siwarî pêk anî. Ji dêvla parvekirina ganîmetan her dem maaş da leşkeran. Ji ber leşkerên ku pêdivî pê hebû kêm bû xelkên ku li herêmê dijiyan rêveberiya Mervan eciband.

Di sala 744'an de gava dema xelîfetiya Yezîdê III'yem hat Mervan waliyê Mezopotamyayê bû. Mervan xelîfetiya Yezîd ê III'yem nepejirand û bi artêşa xwe ajot ser Şamê. Di nava vê artêşê de yekîneyeke ku ji ermenên hê gava Mervan waliyê Qefqesyayê û têkiliya wî bi wan re xweş bû hebû.



Tê gotin ku di serdema pêşîn de Mervan xwe ji bo xelîfetiyê wekî endam pêşniyaz nekiriye, li Şamê Yezîdê III'yem piştgirî dida û dixwest ji her du kurên Welîdê II'yem yek bibe xelîfe.

Mervan bi êrîşa ku kiribû re bajarê Ximşê bi dest dixe û paşê di navbera Balbek û Şamê de artêşa Yezîd ku di bin fermandariya Silêman Hişam de bû têk bir. Di wê demê de her du kurên Welîdê II'yem Brahîm û Silêman bi fermana Yezîd hate kuştin. Piştî vê yekê Mervanê ku di şer de bi ser ket bû xelîfe. Berovajiya xelîfeyên din Mervan ji dêvla ku li Şamê bi cî bibe li Heran bi cî bû. Li Heranê xwe ji Şamê bêhtir ewle hîs dikir. Tam di vê serdemê guftûgoyên ku Mervan ne emewî ye kurd e li derdorê belav bû. Erebê Sûriyeyê ku ji destçûyîna giraniya bandora Şamê aciz bûn, serî hildan. Gelekî zehmet be jî Mervan ev serhildan têk bir.

Xelîfetiya xwe da qebûlkirin. Xelîfetiya Mervan li hêlên din ê împeretoriya îslamî bêhtir dirêj dom kir. Li Iraqê malbata Harîdît ku desthilatdariya wî nedipejiran têk bir û şand sigûnê. Mervanê ku di sala 747'an de demekê xelîfetiya xwe bi hemû êlan(eşîran) dabû qebûlkirin, piştî serhildana Ebasiyan bi artêşa xwe ajot ser îsyankaran.

Her du artên di sala 750 de li Zapê hatin hemberî hev. Li hemberî Mervan artêşeke ku ji leşkerên îranî, erebên şîa, Ebasiyan pêk dihat hebû. Mervanê ku artêşeke wî ya qelebalix hebû, ji eniya hember êrîşî leşkerên bi rim ên Ebasî kir. Mervanê ku fikirî tecrubeyên ji rêzê yên şer ew ê têr bike bi awayekî xedar têk çû û ligel du kurên xwe û hindik leşkerên xwe ji qada şer qetiya. Di vî şerî de ji malbata Emewiyan 300 kesên xuya jiyana xwe ji dest da.

Siwariyên Ebasiyan heta bajarokê Bûsir ê Misrê bi sedan kîlometreyan Mervan şopandin û li vir piştî şerekî kurt di 6'ê Tebaxa 750 de hate kuştin. Serê wî yê jêkirî siwariyekî ereb ji bo Ebû Ebbas ku bi nasnavê xwe "Xwînrij" bû bir Bexdayê. Kurê wî Ubeydullah reviya Habeşîstanê lê ew jî ji şûrê Ebasiyan xelas nebû.

Her wisa hewldana Mervan ê II'yem ku navenda xelîfetiyê ji welatên ereban bîne Kurdistanê û belkî jî berdêla kurdbuna xwe bi awayekî gelekî trajîk da. Belkî jî tenê ji ber ku kurd bû xîlafeta wî bi dawî bû.

**Paşê çawa bû?**

Ebasiyan ji bo ku şopa Emewiyan ji cihana Îslamê bibe, rêbazeke ku dî dîrokê de emsalê wê nîn e şopandin. Li Şam, Kînnesrîn û li bajarên ku Emewî lê bi cî bûne, hemû goristanên Emewiyan vekirin û cenazeyên wan ji hole rakirin. Cenazeyê xelîfeyê Emewiyan ê Hîşam ji gora wî ya li El Rûşefayê derxistin, 80 carî hate kêrkirin û hate şewitandin. Ebasî di 25'ê Hezîrana 750'yî de ji bo 80 kesên ku xwîna Emewiyan e bibexşînin li Ebû Fûtrûsê li hev civiyan. Sifreyeke mezin hatibû amadekirin. Çawa ku pîrozbahiyan dest pê kir leşkerên Ebasî şûrê xwe dikşînî û serê hemû emewiyan difirînin.

Piştî vê sîxurên Ebasiyan dest pê kir yên ji malbata emewiyên ku li her çar aliyê Împeretoriya Îslamê belav bûbûn yeko yeko kuştin.

Ji vê qetliyama tirsnak yê ku tê zanîn, tenê yek filitî. Evbdirehman Îbn Mûawiyeyê neviyê xelîfeyê Emewiyan Hîşam ku piştî rev û xweveşartina bi salan derbasî Nîvgirava Îlberê bû û li vir dewleta Emewiyên Endulusê ku wê sê sed salî bijî ava kir.

## Li Hewlêrê mîhrîcana Aştiya Cîhanê tê lidarxistin

**HEWLÊR -** Nûnera UNAMI'yê ya Herêma Kurdistanê Morik Hedirson diyar kir ku dê di demek nêz de Mîhrîcana Aştiya Cîhanê bê lidarxistin.

Nunera Mîsyona Piştgiriyê ya NY'ê ya li Iraqê (UNAMI) Morik Herderson pêr li Hewlêrê ji aliyê parêzgerê Hewlêrê Newzad Hadî ve hat pêşwazîkirin. Hat ragihandin ku di hevdîtina her du aliyan de guftûgo li ser lidarxistina Mîhrîcana Roja Aştiya Cîhanê kirine.

Di hevdîtinê de hat gotin ku rewşa aram a Başûrê Kurdistanê ji bo lidarxistina mîhrîcanê dest daye û biyar hat dayîn ku di demek nêzîk de mîhrîcan bê lidarxistin.

## Li Enqereyê pêşengeha 'aştî, huner û cîhanê'

**ENQERE -** Li Enqereyê, pêşengeha "aştî, huner û cîhanê" ya ji berhemên 25 hunermandan pêk tê hate vekirin. Şaredariya Çankayayê pêşengaha ji bernameyên 25 hûnermendan pêk tê ya "Aştî, huner û cîhan" ku aştiyê tîne ziman vekir. Şaredarê Çankayayê Bulent Tanuk ku di pêşengeha li Galerî Kara vebû de axivî, diyar kir ku ji bo avakirina aştiyê û Tirkiye ji tariyê xilas bibe lazim e hêstiyariya hûnermendî û xebatên hunerî bên zêdekirin. Pêşengeh, dê heta 23'yê îlonê vekirî bimîne.



2010

XELATÊN ROJNAMEGERIYA KURDÎ Û
ŞEHÎDÊN ÇAPEMENIYÊ YÊN MÛSA ANTER



MÛSA ANTER

XELATÊN ROJNAMEGERIYA KURDÎ Û
ŞEHÎDÊN ÇAPEMENIYÊ YÊN MÛSA ANTER

ŞERTÊN TEVLIBÛNÊ:

- Pêşbazî bi du zimanan ango bi kurdî û tirkî pêk tê.
- Xelat di 4 kategoriyên weke 'Nûçeyên bi kurdî', 'Nûçeyên bi tirkî', 'Fotograf' û 'Karîkatur' de tê lidarxistin.
- Ji bilî van kategoriyan dê Xelata Juriyê ya Taybet a Gurbetellî Ersoz bê dayîn.
- Di her kategoriyê de dê bi tenê xelatek bê dayîn.
- Di kategoriyên nûçe û fotografan de ji bilî berhemên ji pêşbaziyê rerasterast hatine şandin, dê berhemên desteya hilbijartinê jî pêşniyar kirine li ber çavan bêne girtin.
- Di her kategoriyên wekî, 'nûçe', 'fotograf' û 'karikatur' de xelatê pereyan dê bê dayîn û ji bo her yek ji wan 2 hezar û 500 TL ye.
- Endamên juriyê û xebatkarên rojnameyên 'Gunluk' û 'Azadiya Welat' nikarin tevli pêşbaziyê bibin.
- Berhemên ku bêne şandin an divê nehatibin weşandin an jî piştî 20'ê îlona 2009'an hatibin weşandin.
- Berhemên bêne şandin divê herî dereng heta 14'ê îlona 2010'an bigihijin ber desteya hilbijêr.
- Her kes bi tenê di kategoriyekê de dikare tevli pêşbaziyê bibe.
- Berhemên ku ji bo kategoriya 'nûçeyan' tên şandin divê bi 5 nusheyan bigihijin ber destê juriyê.
- Li ser berhemên wekî; karikatur û fotografan kunye hebe. Ango li pişta fotograf an jî karîkatur li quncikê çepê yê jêr etîketek hebe û li ser (navê fotograf, çima hatiye çêkirin an jî kişandin, kengî û li ku) agahiyên esasî cih bigirin. Divê berhem bi mezinahiya 18x24 cm û rengîn an jî reş-spî bin.
- Navên ên ku xelat qezenc kirine dê di 15'ê îlona 2010'an de bên aşkerakirin. Xelat dê bi merasîmeke mezin di 20'ê îlona 2010'an de li xwediyên wan bên belavkirin.
- Berhemên hatin li xwediyên wan nayên vegerandin û dê di rojnameyê de bêne weşandin.
- Namzet divê kurtejiyana xwe ligel berhemên xwe û fotografê xwe ji navnîşanên jêr re bişînin.

*Xelatên Rojnamegeriyê û Şehîdên Çapemeniyê yên Mûsa Anter, 1993 - "Özgür Gündem", 1994 - "Özgür Ülke", 1995 - "Yeni Politika", 1996 - "Demokrasi", 1997 û 1998 - "Ülkede Gündem", 1999 "Özgür Bakış", 2000 - "2000 - Yeni Gündem", 2001 û 2002 - "Yedinci Gündem", 2003 - "Yeniden Özgür Gündem", 2004, 2005 û 2006 - "Ülkede Özgür Gündem", 2007 - "Gündem", 2008 Azadiya Welat û Alternatîf, 2009 Azadiya Welat û Günlükê dan.*

**NOT: Xelat dê bi merasîmekê li Amedê ji xwediyên wan re bên dayîn.**

**'Nûçeyên bi kurdî' jî dê ji vê navnîşanê re bêne şandin:**
'Nûçeyên bi kurdî' jî dê ji vê navnîşanê re bêne şandin: Huzurevleri Mah. Dr. Sıtkı Göral Cad. 13. Sok. Yeni Bina Kürtçe Dil Kursu Kat: 2 Kayapınar / DİYARBAKIR Tel: (412) 237 48 91 Fax: (412) 237 48 89

**'Nûçeyên 'bi tirkî', 'karikatur û 'fotograf' dê ji vê navnîşanê re bêne şandin:**
Nûçeyên bi tirkî, karikatur û fotograf' dê ji vê navnîşanê re bêne şandin: Şehit Muhtar Mah. İstiklal Cad. Mis Sok. Umutcan Apt. No: 19/4 Beyoğlu / İSTANBUL Tel: (212) 244 13 85 Fax: (212) 244 09 41

JURIYA NÛÇEYÊN KURDÎ:
Mazhar Gunbat
Mesûd Hamîd
Leyla Ayaz
M. Alî Ertaş
Tayîp Temel

JURIYA NÛÇEYÊN TIRKÎ:
Huseyîn Aykol
Ertugrul Kurkçu
Fatîh Polat
Berat Gunçikan
Ahmet Tulgar

JURIYA WENÊYAN:
Ramazan Ozturk
Gultekîn Tetîk
Îsa Çelîk
Çerkes Karadag
Hacer Persîdat

JURIYA KARÎKATURAN:
Tan Oral
Gulay Batur
Ender Ozkahraman
Sarkis Paçaci
Halîl Încesu

www.arsivakurdi.org

Rupel 12yeni+++++++:Layout 1 07.09.2010 14:56 Page 1


# Rojeva Welat

8 Îlon 2010 Hejmar: 1 Sal: 1 www.welat.com

**ROJEVA WELAT**
**Zozan Basın Yayın Adına**
**İmtiyaz Sahibi:** Eser UYANSIZ
**Yazı işleri Müdürü:**
Sevim KAPLAN

***Yönetim Yeri:***
Diclekent Bulvarı
Termil Apt. Kat:3 No:9
Kayapınar / DİYARBAKIR
***İdare Tel:*** 0 (412) 251 38 88

***Yayın (Weşan)***
***TEL:*** 0 (412) 237 48 90-91
***Fax:*** 0 (412) 237 48 89
Baskı ***(ÇAP):***
***Stenbol:*** Gün Matbaacılık,
Reklam, Film, Basım, Yayın,
Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Telsizler Mevkii Beşyol Mah.
Akasya Sok. No: 23/A
Küçükçekmece / İstanbul
***Tel:*** 0 (212) 580 63 81
***Edene:*** Arslan Güneydoğu
Gazetecilik, Matbaacılık,
Kağıtcılık A.Ş
İstîklal mah. İstîklal. Cad.
***No:*** 44 Seyhan / Adana
Yaygın süreli yayındır.


## Heyecan heye lê, pere tune!



**WAN / DÎHA** - Ligel ku ji Cejna Remezanê re demek hindik maye jî esnafên ku li kolanan bi cih bûne û bazara cejnê danîne, ji ber ku firotin çênabe bi gazinc in. Her wiha gel jî ji ber ku pereyê wan tuneye danûstendinê bike gazincan dikin. Li maxazeyên mezin rewşeke pir bê deng derdikeve holê. Esnaf jî sedema vê rewşê rawestandina bazirganiya sînor dibîne.

Ji Cejna Remezanê re demeke kin ma. Lê di vê cejnê de hem seyarfiroş hem dikanên mezin û hem jî maxaze ji ber ku danûstendin çênabin bi gazinc in. Welatiyên ku yek bi yek li ser erebeyan digerin û hewl didin ku bi buhayekî erzan ji zarokên xwe re cilan bikirin, ji ber ku buha gelek zêde ne gazincan dikin. Li Wanê li Kolana Huner, Kent, Yenî Yol û Cadeya Cumhuriyetê seyarfiroşan dezgehên xwe danîne û her cureyê amûran difiroşin. Seyarfiroşan diyar kir ku li gorî salên din îsal danûstendin gelek kêm e.

Sedema vê rewşê jî, bazirganiya sînor ya ku hatiye asta tunebûnê tê nîşandan. Welatiyê bi navê Şakîr Aladag ku ji bo danûstandina cejnê derketiye bazarê der barê buhayan de axivî û diyar kir ku buha gelek zêde ne û wiha pê de çû: "Ji ber ku em betal in pereyê me tune ku em mesrefa cejnê bikin. Ev yek jî ji rewşa betaliyê ya herêmê diqewime. Her çiqas bê gotin ku li Tirkiyeyê krîz tuneye jî li herêmê û Wanê krîz heye. Ji ber ku fabrîka û derfetên kar tuneye. Gelê vir bi betaliyê re rû bi rû ye. Ji ber vê jî welatî nekarin di cejnê de jî ji zarokên xwe re tiştekî bitsînin." Seyarfiroşê bi navê Aydin Kahraman jî der barê mijarê de nêrînên xwe anîn ziman û da zanîn ku li gorî salên borî danûstendin gelek kêm e û ji ber ku li herêmê bazirganiya sînor qediyaye gelê herêmê jî bi xizaniyê re rû bi rû maye. Kahraman destnîşan kir ku dewletê bi zanebûn bazirganiya sînor qedandiye û kurd muhtacê xwe kiriye.

## Şaredariya Colemêrgê ji bo cejnê bazara gel ava kir

**COLEMÊRG** - Şaredariya Colemêrgê ya BDP'ê bi wesîleya Cejna Remezanê, li taxa Bulakê bazara gel ava kir .

Şaredariya Colemêrgê bi armaca ku ji welatiyan re derfetan ava bikin li taxa Bulakê bazara gel ava kir. Welatiyên ku astengiya aborî dikişînin, bi sermiyaneke gelek kêm ji bo ku mesrefa xwe ya cejnê bikin, ketin nava hewldanan. Li aliyê din bazarên gel yên ku ji bo welatiyan di warê aborî de zêdetir baş in eleqeyeke mezin dibîn. Her wiha welatiyên ku dezgeh vekirine û amûran jî difiroşin ji ber ku firotin pêk nayên bi gazinc in. Di hefteyê de carekê bila derfetê me yê firotinê hebe.

Seyarfiroşê bi navê Serhat Şahin ku li bazarê karê firotinê dike, diyar kir ku ji ber ku şaredariyê derfet daye wan spas dike û wiha got: "Ev derfetên bi vî rengî tenê di cejnan de ji bo me tên dayîn. Em ji serokwezîr rica dikin. Bila piştî cejnê ji bo me cihên bazaran amade bikin. Bi vî awayî em ê bikaribin debara ma-lbatên xwe bikin."

# Gundê 53 malî hêj bê av e

### Gundê Dêrîka Anêrê ya navçeya Gimgimê bi salan e bê av e. Gundiyan diyar kir ku heta niha ji bo çareseriyê serî li gelek rayedaran dane, lê heta niha tu encam bi dest nexistine

Gundiyên gundê Dêrîka Anêrê ya navçeya Gimgimê bi salane pirsgirka avê dijîn. Gundî ji bo pirsgirêka avê çareser bikin li gorî derfetên xwe kaniya nêzî gund bi kevinaran dorpêç kirine.

Gundî bi metereyan avê dikşînin malan, lê ji ber ku nifusa gund zêde dibe êdî ava kaniyê têrî malan nake. Gundiyan diyar kir ku di sala 1999'an de li gund ji bo avê depo çêkirine, lê ji ber ku av kêm bûye nayê bikaranîn. Gundiyan, da zanîn ku pirsgirêk ji cihên eleqeder ra birine lê tu çareserî peyda nekirine. Gundiyan anî ziman ku debara xwe bi sewaltiyê dikin, lê ji ber pirsgirêka avê nikarin sewalan xwedî bikin. Gundiyê bi navê Sabîr Şahîn, diyar kir ku ji bo ew sewalên xwe av bidin diçin ser merayên gundên din û wiha got: "Em mecbûr in sewalên xwe bibin ser çemên gundê din. Zivistanê jî em hemû pediviya xwe ya avê bi vê kaniyê dikin. Li ser kaniyê zivistanê rêz çêdibe."



**'Gotibû gund bê av nemînin'**

Şahîn, anî ziman ku hemû hewldanên wan yê têkildarî pirsgirka avê bê encam mane û wiha axivî: "Li gundê me 35 mal hene. Hemû kes bi metereyan ji vê kaniyê avê tînin. Êdî jin jî naxwazin ji vê kaniyê avê bikşînin. Serokwezîr dibêje 'bi projeyên KOY-DES'ê tu gund bê av naminin' Êdî bila dewlet ji me re çareyekê peyda bike. Heta niha me serî li gelek saziyên dewletê dan. Lê encan tune. Wê demê soza Serokwezîr li ku ma. Ji bo hilbijartinê van sozan didin me fêmnekir. Êdî bila pirsgirêka van mirovan ya avê li ber çavan bê girtin."

**'Divê êdî av ne qeder be'**

Jinên gund jî ji ber vê pirsgirêkê bêçare ne. Jinan diyar kir ku herî zêde ew pirsgirêka avê dizanin û bêzar dibin. Jinan anî ziman ji xeynî serşo, cilşo û vexwarinê ji bo baxçeyan jî avê dikêşin û hemû pêdiviyên avê we temîn dikin. Mîzgîn Yilmazer diyar kir ku divê ev yek ji wan re wekî qeder neyê dîtin û ew jî dixwazin di malên xwe de makîneyên cilşoyê bikar bînin û wiha got: "Temenê min 20 salî ye û heta niha av li gundê me tune. Ji bo ku em cilan bişon av tune. Mirovên vi gundê hefteyê carekê ancax serê xwe dişon. Ji ber ku her roj li wir bi bîdonan avê dikêşin gelek zor e. Ji ber ku deriyê kaniyê jî vekiriye ava kaniyê qirêj dibe û gefan li tenduristiyê dide. Divê dewlet li hemberî van pirsgiran bi xemsarî tev negere." **MÛŞ - DÎHA**

## Wan bendawarê ayîna ermeniyan a 19'ê îlonê ye



Piştî li Dêra Sumela ya Trabzonê ayîna 88 salan ku zêdeyî 3 hezar xirîstiyan beşdar bûn, pêk hat, niha jî ermenî li benda ayîna Girava Axdamarê ya di19'ê îlonê de ne. Şaredariya Wanê, walitî, karsaz û firmayên gerê amedekariyên xwe bidawî kirin

Li Wanê di 19'ê îlonê de dê li Dêra Girava Axdamarê ayîna ermeniyan çêbibe û li bendê ye ku ermenî bi qelebalix beşdarî ayînê bibin. Şaredarî, walitî, karsazên otêlan û firmayên gerê (geştê) di çerçoveya ayîna di 19'ê îlonê de amedekariyên xwe di ber çavan re derbas dikin û welatî li benda roja ayînê ne. Şaredariya Wanê di çerçoveya ayîna di 19'ê îlonê de kontrolên xwe li ser otêl, aşxane, qehvexane, pastane, salonên taştê, kuafor û marketan zêde kirin, rayedaran jî diyar kir ku kontrol dê heta roja ayînê bidomin.

Şaredariya Wanê, dê şaredarên ermenî yên ji Ermenîstanê heta her çar aliyê cihanê bên wanê bicih bikin û ermeniyê ji bo ayînê jî tên dê bigihijîne Grava Axtamara yê. Şaredarî dê li gravê konêkî veke û bi jeneratoreke 75 kw pêdiviya ceryanê ya giravê binê cih. Şaredarî dê ji 16'ê îlonê pê ve 15 personelê xwe li giravê bi cih bike, li vir dê peywira paqijiya giravê, hilgirtina alavan pêk bînin. Şaredarî dê ji bo çalakiya 18'ê îlonê li Salona Girtî ya Sporê jîpêkanîna dikê û dîzayn kirina wê bîne cih.

**Ji nû ve hatine çêkirin**

Li aliyekê ji bo ayîna di 19'ê îlonê de ya li Dêra Grava Axdamarê de amedekariyên dawî tên kirin, li aliyê din ji bo turîstên ji hundir û derve bên kafe, otêl û aşxane ji nû ve têne çêkirin û amedekariyên xwe gihandin qada qedandinê. Otêl û aşxane li derve û hundir hatine tamîrkirin û hinek otel jî ji serî ve hatine nûkirin û di odeyên otêlan de televîzoyên LCD hatine bicihkirin.

Xwediyên otelan diyar kir ku Wan ji danasandina xwe di rojên dîrokê de derbas dibe û ji bo vê yekê jî çi ji destê wan bê ew dê bikin. Walitiya Wanê, bi giştînameyêkê xwest ku ogretmenevî, polîsevî, yûrdên xwendekaran, mêvanxaneyên saziyan ji bo tûrîstan bên valakirin. Mêvan dê bi mîşe (ucret) bêne bicihkirin û ji mêvanên turîst re pêştgirên semgola Wanê bên dayîn. Hate zanîn ku ji bo kesên li dêrê bicih nebûne li derve barkovîzyon hatine sazkirin, keştiyên nû dê rêwiyan bibe gravê.

Her wiha ligel şaredarî, walitî û karsazan rojnameyeke herêmî Rojnameya Şehrivan jî kampanyayek daye dest pê kirin ku wanî deriyên xwe ji ermeniyan re vekin. Di çerçoveya kampanyayê de zêdetirî 4 hezar malbatan serî li rêveberiya rojnameyê dane. Serlêdan hêj didomen û her wiha yên ku li otel û mêvanxaneyan bi cih nebûne dê li van malan bê pere bimînin. Gelê Wanê dê bi vê helwestê mêvanperiya xwe nîşanî cihanê bide.

Hate zanîn ku li bendê ye ji hundir û derveyî welat 6 hezaran zêdetirî ermenî bên bajêr û roja ayînê jî piyanîst û bestekarê ermenî Şahan Arzunî ku li Stenbolê ji dayîk bûye, li dêrê berhemên xwe bîne zimên. Di çerçoveya amedekariyên ayînê de heyeteke ku ji 3 kesan pêk tê û di nava wan de Serokê Meclisa Rûhanî ya Patrîkê Ermenî Serpiskopos Aram Ateşyan bi Şaredarê Wanê Bekîr Kaya, Walî Munîr Karaloglu û Serokê VATSO'yê Zahîr Kandaşoglu re hevdîtin pêk anî û der barê amedekariyan de agahî dan û wergirt. **WAN - DÎHA**

# Şaredariya Akdenîzê xizan ji bîr nekirin

Şaredariya BDP'ê ya Akdenîzê bi feraseta şaredariya civakî di meha Remezanê de dest bi serferberiya alîkariyê kir û 30 hezar malên ku pêwîstiya wan bi alîkariyê hene alîkarî da wan.

Di çarçoveya xebatên yekîneyê yên vê mehê de bû, 30 hezar paket ên alîkariyê li xizanan tê belavkirin. Nexşeriya alîkariya pakêtên alîkariyê di civîna giştî ya 56 keya ku Şeredar M. Fazil Turk jî beşdar bûbû de hatibû diyarkirin. Ligel şaredariyê karsazên xêrxwaz jî piştgiriyê dan xebata alikariyê. Di belavkirina pakêta alîkariyê de bextewariya xizanan û zarokên wan li rûyên wan dida. Keyayan ji ber vê alîkariya mezin spasiya xwe ji bo Şaredar Fazil Turk pêşkêş kir. Şaredar Turk li ser xebatê daxuyanî da. Di daxuyaniyê de da zanin ku nexşeriya alîkariyê ligel xebatkarê şaredariyê û keyayên taxan hatiye diyarkirin û piştî vê, paketên alîkariyê hatine belavkirin. Ji ber hesasyeta welatî rencîde nebin kolî bi taybetî piştî fitarê di tariya şevê de li malê xizanan hatine belavkirin. Turk got milyonan xizan hene û ew dê her tim piştgiriya xizanan bikin.



Turk vegot ku ligel peywira şaredariyê ya esasî û klasîk, peywira xwe ya civakî jî heye û wiha got: "Em bi feresata şaredariya gelperest û civakî hewl da ku di meha Remezanê de 30 hezar paketên alîkariyê amedekirina bû bi destê yekîneyên xwe yên gîhandine malbatên xizan." Turk destnîşan kir ku dê di çarçoveya derfetên heyî de van alîkariyên xwe dê bidomînin. **MERSÎN- DÎHA**